



# 4 saliya Azadiya Welat li we pîroz be!

## Her tim zimanê zikmakî

Rojnameya me Azadiya Welat, roja 21'ê rêbendanê ket 4 saliya xwe.

Azadiya Welat ligel hemû pest kotekî û rêlibergirtinên dewleta tirk sê sal li pey xwe hiştin. Çarsaliya Azadiya Welat li hemû gelê me pîroz be. Di vê heyama ragihandinê de nebûna rojnameyeke rojane kêmasiyek e. Divê em rojnameya xwe ya heftane ji bo gihîştina rojnameyek rojane bikin pir. Bi vê hêviyê em dibêjin; *Di hemû warên jiyane de zimanê zikmakî!*

# WELAT

Azadiya

Rojnameya Hefteyî

156

23-29 rêbendan (Ocak) 1999

BUHA (Fiat) : 200.000 TL




*Platforma Hêzên Neteweyî ya Bakurê Kurdistanê:*

# Êdî kes nikare nebûna yekîtiyê bike hincet



Nivîskar û lêkolînerê kurdolojiyê Mehmet Bayrak:




## Komara Tirk ji darizandinê ditirse

■ Rêxistinên bakurê Kurdistanê protokola salên 93 û 95'an di sala 1999'an de xurtir kir. Di rêbendanê de rêxistinên Bakur li hev civiyan û ji bo pêşerojê stratejiya xwe diyar kir. Heta niha li dora pênc rêxistinên bakurê Kurdistanê tevî vê platformê bûne: PKK, Partiya Îslamî ya Kurdistan (PÎK), PSK, PRK-Rizgarî, Partiya Komûnîst a Kurdistan (KKP). Her wiha bo tevlihbûnê HevgirtinWelatparêz û KAWA'yê jî serî li platformê daye. (Nûçe:R.3)

■ Di van demên dawîn de çetebûna ku xwe serdanpê li hemû dem û dezgehên dewletê rapêçandiye, nîşan dide ku hêzên mîlîtarîst û tarî çiqasî bitesîr û xwedî hêz in. Lê tevî van hemû rûdanan jî ev pêvajoyê dê rûyê leşkeran eşkere bike û dewletê bixe tengasiyê mezîn. Her wiha wê ji bo çareserîya siyasî zorê bide wan. (Hewpeyvîn:R.8-9)

## Azadiya WELAT



SAMİ TAN

Gotina "bazara kurdî kesad e" dûrî bîrdoza me ye. Di nava salekê de Azadiya Welat çeperên teng şikênandin û li gelek bajaran şax veda.

## Çarsaliya Azadiya Welat

Di 21'ê rêbendanê de rojnameya Azadiya Welat sê sal li pey xwe hiştin, kete sala çaran. Dema di 21'ê rêbendanê 1996'an de weşana rojnameyê dest pê kir, ji ber ezmûna rojnameyên berê, hinek şik û guman bi me re hebûn; gelo dê rojname karibe çiqas weşana xwe bidomîne, dê kîjan kêşe û alozî derkevin pêşberî me? Lewre wan rojan gotina "bazara zimanê kurdî kesad e" gelekî dihate dikirandin. Li gorî baweriya wê rojê, weşaneke bi zimanê kurdî nikaribû li ser piyên xwe rawestiya, diviya bû ji gel alîkarî bistan.

Digel van şik û gumanan bîr û baweriya me pêwîstiya derxistina rojnameyêke bi vî rengî li ser me dikir ferz. Lewre bi milyon kurd hebûn û bi zimanê wan weşaneke hefteyî nîn bû. Her wiha gelê kurd bi doza xwe hesiyabû, li dijî zilm û zorê serî hildabû. Zarokên roj û êgir bi destelepê dajot ser panzeran. Diviya bû kesên ku ji destê wan dihat, weşaneke bi

zimanê kurdî yê xweşik pêşkêşî gel bikira, nehiştta ku yek ji xweşikîrîn kulîlkên baxçeyê cihanê bi destê dagirkeran bê qurmîçandin û di nav dest û piyên wan de biçilmise.

Li vir divê mirov hinekî li ser hewesta dewletê jî raweste. Armanca dewletê ya sereke ev bû ku rojnameyê di nava çeperêkî teng bigire, hêdî hêdî çeper lê tengtir bike û dawîya dawî jî bike ku weşana rojnameyê bê rawestandin. Di weşanên berî Azadiya Welat de ev daxwaza dewletê pêk hatibû, lê dê îcar ew daxwaza wan di gewriya wan de bima.

Xebata sê salan nîşan da ku ev gotina "bazara zimanê kurdî kesad e" ne li gorî kesên xwe ku piştta xwe dane tevgeran milyon e. Gelê me yî ku li hemberî dagirkeran li seranserî cihanê rabûye ser piyan dikare bi dehan weşanan li ser piyan bihêle û bike ku ew karê xwe bi şeweyê herî baş bimeşînin. Bi taybetî di vê sala dawî de ev yek bi awayekî vekirî derket holê. Diyar bû ku ev gotina li jor dîrî

bîrdoza me ye û bandora bîrdoza "rewşenbîrên serbixwe" a li ser me nîşan dide. Di nava salekê de Azadiya Welat çeperên ku dagirkeran li dor danîbûn şikênandin û di serî de li Amedê li gelek bajarên Kurdistan û Tirkiyeyê şax veda. Li hemberî vê yekê neyaran rojname li OHAL'ê qedexe kir, zor û zilma li ser rojnameyê zêdetir bû. Ev yek jî nîşan dide ku em li ser riyayê rast in.

Berê hêvî bi Ewrûpayê ve dihate girêdan, îro ev bawerî hatiye guhartin, lê nûnerên rojnameyê yên li Ewrûpayê ji berê baştir dixebitîn. Niha kampanyaya bi navê "Di çar saliya Azadiya Welat de 400 abone" dest pê kiriye. Em ji hevalên ku ev kampanya daye destpêkirin re dibêjin bila destê we ter û şîr be. Em hêvî dikin ku dê bi awayekî serkeftî biçê serî. Çarsaliya Azadiya Welat li gelê kurd û hemû xebatkar û xwendekarên rojnameyê pîroz be.

Bijî Azadiya Welat û bijî welatê azad!

## Tu bi xêr hatî 99!

## Ferhengok

akam: encam	heyveron: mehtab
berate: cenaze	hoy: şert
berbejn: nivîst (muska)	lêzim: meriv (akraba)
berdenivîs: yazıt	merc: şert
berevanî: berhingarî (savunma)	mûçing: cimbiz
bêserûber: bêpergal (düzensiz)	nivîst: muska
biserûber: bipergal (düzenli)	pejinkarî: hasas (duyarlı)
çirçirik: circir böceği	qerzdar: deyndar
çortî: tevger û gotina nexweş	qumqumok: gumgumok
dahatû: ayende (gelecek zaman)	rastgo: harbî (açık sözlü)
dahûrandin: analîzkirin	rastrê: rasterast (direk)
diwaroj: pêşeroj (gelecek)	rêwîngî: rêwîti (yolculuk)
doman: pêvajoyê	rojhilatnas: oryantalist
êrişbazî: êrişkarî (saldırganlık)	sede: sedsal
fetlane: dönemeç	serçavî: serkanî
gemaro: ambargo	serjimar: gelhe, nifûs
geremol: tevlihevî	serwext: hişyar (farkında olan)
guncan: mûsait	şewekar: grafiker
handêrî: teşwîqkarî	teşe: qeware, form
henase: nefes	teyîsîn: birûsîn (parildamak)
hevrû: rûber (karşılaştırma)	trembêl: erebe
hewtûn: reyîn (havlamak)	veniştin: çonvedan
	zîzikandin:
	zûzikandin (hızla dönmek)

VEDAT AYDIN

Ji sedsala bîstan saleke dinê çû. Û saleke nû bi hêvî û daxwazên nû bi ser me de hat. Oxir be sala par. Oxir be '98! Te bi xwe re êş û jan, berdêlên bêhempa birin. Te bi xwe re birin laşên ciwan; yên bi êgir û bombeyê hatine pîrozkirin. Te bi xwe re birin kul û elem; lê di paşila te de veşartî man nîrxên birûmet, hêjahiyên mirovahiyê...

Tu bi xêr hatî sala nû. Merheba '99! Di pey berf û bahozên sala çûyî de, tu bi xêr hatî, silav sala nû; bi hêvî û daxwazên serkeftinê tijî, bi hêza bêdawî û te têkçûn nas nekîr. Bi hêza ku cewhera xwe ji êş û janên hezar salan û berxwedanên bêsinor distîne, merheba!..

Belê, sala 98'an ji bo gelê me di nava hemû salên tekoşinê de mîna qonaxeke dîrokî cihê xwe girt. Di vê salê de gelek tişt qewimîn. Gelê me digel rojên xweş û şad, roj û mehên mîna tariya şevê jî dîtîn û bihurandin. Zor û zahmetiyên vê salê giran bûn.

Hê di serê salê de dijmin xwest ku îxaneta xwefiroşekî (Şemo) bike kafenekî reş û li gelê me bipêçe. Ji bo vê jî şerekî ku heta wê demê nehatibû dîtîn, meşand. Ev şer hem ji aliyê leşkerî hem jî ji aliyê psikolojîk ve

di asta herî bilind de domand.

Operasyon li dûv operasyonê li dar ketin. Tevî dehan generalên xwe daketin qada şer. Lê tev behewa çûn. Medyaya Mehmetçik ji her aliyê ve şerê qirêj parast û heta dawiyê xwe xiste xîzmeta vî şerê gemar.

Heman plan li Başûr jî hate meşandin. Li wir jî kurdên xayîn ajot ser şervanên azadiyê. Dijminan birîna xedar, îxanet sor kir û bi ser bizava azadiyê de şand. Wan jî li gorî za-

Di 98'an de şerê qirêj hate merhaleyeke wisa ku digel agirbesta PKK'ê jî dil hebû şerekî herêmî derbixe. Komploya 9'ê cotmehê li dijî Şerê Rizgariyê komployek navneteweyî bû.

gonên îxanetê rola xwe list

Lê planên dijmin bêbersiv neman. Çi di qada şer de, çi di qada gel de û çi jî di qada zindanan de bersiv bi berxwedaneke dîrokî û dilsoz hate dayîn. Gelê Kurd bi raperînen xwe îspat kir ku ew di merheleya serhildanên nû de ye. Gerîla bi çalakîyên xwe bersiva generalan da. Di zindanan de Sema û Fikriyan bi êgir, dilsoziya xwe bo gel û serokatiya xwe diyar kirin.

Zilma dijmin bêsinor bû. Ji hovîti û xwînxwariya Komara Tirk re rawestî tune û. Şerê qirêj hate merha-

leyeke wisa ku digel agirbesta PKK'ê jî şerekî herêmî derbixe. Komploya 9'ê cotmehê li dijî Şerê Rizgariyê komployek navneteweyî bû. Lê ev komplo bi meşa Serokatiyê ya ber bi Romayê ve vala derket. Digel vê yekê çalakîyên ku li zindanan bi pêşengiya hevalê M. Halit Oral dest pê kir û bi dehan girtiyên azadiyê berdewam kir, li hemberî êrişên faşîst û hovane bû bendek ji êgir.

Gelê me jî bi serhildanên xwe bersiva xwe da û di vê pêvajoya dijwar de jî dîsa gelê Kurdistanê bi ser ket.

Di dawîya salê de careke din komplosaz û êrişkar têk çûn, gelê kurd bi yekîtiya xwe ya neteweyî, bi giyana bersiwedanî bi ser ket. Lê ev yek bi bedelên mezin, bi cango-riyên welêt hate bidestxistin.

Kesên ku dixwest sala 98'an ji gelê kurd re bikin sala mirin û nemanê, ew bi xwe di vê salê hinekî din fetisin, derbeyên xedar xwarin û wan ber bi dawîya xwe yî bêyûm ve gaveke din avêt.

Digel her tiştî careke din oxir be sala 98'an. Merheba '99' tu bi hêvî û xeyalên serkeftinê têtîyê pêşwazîkirin. Tecrûbeyên ku ji kêmasî û xeletiyên 98'an hatine girtin, wê bibin bingeha serkeftina te. Di nava gelê cihanê de êdî gelê kurd jî cihê xwe yê bi rûmet dixwaze bigire. Yan tuyê bibî sala Kurdistanîyan an jî Kurdistanîyên li xwe jîyan heram bikin.

## Platforma Hêzên Neteweyî ya Bakurê Kurdistanê:

# Êdî kes nikare nebûna yekîtiyê bike hincet



Öcalan bi çûyina xwe ya Romayê gelek tişt guhartin. Hêzên Kurdistanî nêzî hev bûn. Aliyê herî balkêş a vê platforma dawîn jî guherîna nav û armanca wê ye. Berê Platforma Rêxistinên Kurdistanê Bakur dihate gotin. Lê îro wateyê neteweyî lê hatiye barkirin û navê wê bûye Platforma Hêzên Neteweyî ya Bakurê Kurdistanê.

Rêxistinên kurdên bakurê Kurdistanê protokola salên 93 û 95'an di sala 1999'an de xurtir kir. Di meha rêbendanê de rêxistinên Bakur li hev civiyan û wan ji bo pêşerojê stratejiya xwe diyar kir. Heta niha li dorê pênc rêxistinên bakurê Kurdistanê tevî vê platformê bûne. Rêxistinê di nava platformê de ev in: Partiya Karkerên Kurdistan (PKK), Partiya Îslamî ya Kurdistan (PÎK), Partiya Sosyalist a Kurdistan (PSK), Partiya Rizgariya Kurdistan (PRK-Rizgari), Partiya Komûnîst a Kurdistan (KKP). Her wiha bo tevlihbûnê Hevgerîna Welatparêz û KAWA'yê jî serî li platformê dane.

Rêxistinên kurdên bakurê Kurdistanê yekemîn car di sala 1993'yan de piştî agirbesta yekemîn a yekalî ya PKK'ê li hev civiyabûn. Hingî 12 rêxistinên bakurê Kurdistanê dixwest ku Eniya Demokratîk a rêxistinên Bakur pêk bînin. Lê ji ber helwesta çend rêxistinên ew xebat bi ser neket. Piştî wê ev rêxistin dîsa di sala 1995'an de li hev civiyane. Piştî hinek danûstandinandinê hevpar derketiye holê. Lê dîsa ev platform jî ber helwesta neyînî ya çend rêxistinên bakurê Kurdistanê xebatên xwe dide rawestandî.

Lê belê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bi çûyina xwe ya Romayê gelek tişt guhartin. Vê gavê hêzên Kurdistanî nêzî hev kirin. Aliyê herî balkêş a vê platforma dawîn jî guherîna nav û armanca wê ye. Berê Platforma Rêxistinên Kurdistanê Bakur dihate gotin. Lê îro wateyê neteweyî lê hatiye barkirin. Navê wê bû Platforma Hêzên Neteweyî yê Bakurê Kurdistanê. Her wiha ev platform wê xwe wekî muhatap bibîne. Ji bo vê yekê jî dê ji nav xwe heyeteke temsîlkar hilbijêre û di qada navneteweyî de dê piştigirî û çareseriyê kêşeya kurd ji Neteweyên Yekbûyî, Parlamantoya Ewropayê û hêzên navneteweyî bixwazin. Em jî li ser vê yekê bi nûnerê PKK'ê û berdevkê platformê yê serdemê Abdurahman Çadirci,

nûnerê PSK'ê Mesut Tek, nûnerê KKP'ê Serhat Çetinkaya, nûnerê PÎK'ê Hikmet Serbilind û nûnerê PRKRizgari Ferit Mirhaç re axivîn.

Nûnerê PKK'ê Abdurahman Çadirci:

### Berpirs Ewropa û Tirkiye ye

Nûnerê PKK'ê û berdevkê platformê yê serdemê Abdurahman Çadirci di daxuyaniya bo rojnemaya me de diyar kir ku, êdî ne Ewropa ne jî dewleta tirk hew dikarin perçebûna kurdan wekî sedema muhatap negirtinê bidin nîşandayîn. Çadirci di berdewama axaftina xwe de da zanin ku eger ew pêk neyê jî dê ev gav bike ku Ewropa û hêzên din hê ciditir nêzî kêşeya kurd bibin. Çadirci axaftina xwe wiha domand: "Aliyê herî girîng e platformê ev e. Êdî ne Ewropa ne jî dewleta tirk dikare bibêje kurd ne yek in. Ji vir û pê de berpirsî li ser Ewropa û dewleta tirk e." Li gorî Çadirci ev platform jî bilî ristê katalizoriyê, heyeta xwe ya temsîlkariyê pêk aniyê û ji bo çareseriyê kêşeya kurd wekî muhatap derketiye pêşberî raya giştî. Her wiha Çadirci diyar dike ku ew xwedî îdiayekê ne. Li gorî wî xebatên bi vî rengî di rojekê angû de rojan de bi ser nakevin. Ew wekî mînak şoreşên ku li cihanê pêk hatine dide û diyar dike ku di wan şoreşan de jî gengaz e ku mirov rastî îdiayên bi wî rengî bê. Ji aliyê din ve Çadirci jî dewleta tirk dixwaze ku rê li ber kesên pejkirî yê li Tirkiyeyê bê vekirin. Li gorî wî ev yek dê çareseriyê nêztir bike. Çadirci wekî dawî jî wiha got: "Bi hatina birêz Öcalan ya Romayê rê li ber nêzîkbûna neteweyî û yekitiyan hebû. Em jî gelê xwe bawer in. Di dîrokê de gelek gelên bidest mafên xwe bi dest xistine. Gelê me jî divê zêdetir bixebite. Belkî jîyan dê diwartî: bibe, lê pêwîst e bi baweriyê xurt li mafên xwe ji her roja derbasbûyî zêdetir xwedî derkeve.

Nûnerê PSK'ê Mesut Tek:

### Eniya demokratîk pêwîst e

Li gorî nûnerê PSK'ê Mesut Tek rêx-

istinên kurdan dikarin li ser bernameyê demokratîk û neteweyî ya hevbeş bêne bal hev. Ew diyar dike ku çî mezî çî biçûk divê rêxistinên kurdan hebûna hev bi-pejirînin û kêşeya navxweyî bi rîya diyalog û aşîyê çareser bikin. Tek, di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Divê li Tirkiyeyê eniyê aşî û demokrasiyê were damezradin. Her wiha divê di nav de hemû hêzên aşîxwaz, pêşverû, demokrat, şoreşger cih bigirin. Çî kurd bin, tirk, elewî, û çî jî êzîdî." Her wiha ew dê xwe jî bo Kongreya xwe ya 5'an amade bikin. Ew jî dewleta tirk daxwaz dikin ku, dewleta tirk guhe xwe bide aşîxwazên Kurdistan û rê li ber demokratîze kirina welat veke.

Nûnerê PÎK'ê Hikmet Serbilind:

### Kurd bi hev re kar dikin

Nûnerê PÎK'ê Hikmet Serbilind jî di daxuyaniya xwe de diyar kir ku ew platform bo yekitiya kurdan hatiye damezrandin. Her wiha li gorî Serbilind dê bi saya vê platformê rêxistinên kurd herdem bêne bal hev û bi hev re danûstandinên bikin. Ew dide zanin ku bi çûyina Ewropayê ya Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ew jî li Brükselê jî bo Kongreya Neteweyê li hev civiyane. Di civînê xebata li dijî dewleta tirk hatiye nîqaşkirin. Piştî wê jî biryar hatiye girtin ku divê ew jî nû ve bi dest xebatên platformê bikin. Serbilind axaftina xwe wiha domand: "Me got pêdiviya kurdan bi dezgeheke neteweyî heye. Ev mesele ne ya PKK'ê angû rêxistineke din e. Dewleta tirk jî jixwe dixwaze wisa bike. Komployan li dijî rêxistinekê li dijî me hemûyan e." Serbilind dide zanin ku ew Kurdistanê wekî xaniyekî dibînin, ew xani jî dişewite û herkes jî di nav wî xanî de ye. Li gorî Serbilind tefandina wî agirî bi yekitiya qewmî a di navbera hêzên kurdan de dê pêk were. Serbilind wekî dawî jî wiha got: "Dewlet bi vê yekê dixwaze me xelas bike. Bila dezgeh çêbibe û kurdan temsîl bike. Bila gelê me jî bibîne ku kurd dikarin bi hev re kar bikin."

Nûnerê KKP'ê Serhat Çetinkaya:

### Kurdên muhatap li holê ne

Li gorî nûnerê KKP'ê Serhat Çetinkaya heta niha gelek derûdorên bawer nedikir ku kurd dê bi vî awayî jî li hev bicivin. Wî da zanin ku eger kurd dê wekî muhatap bînin girtin, va ye kurd li holê ne. Çetinkaya di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku ev gava wan jî bo hemû nêzîkedayînê çewt bersivê e. Li gorî Çetinkaya platform li ser bingeheke elastîkî hatiye damezrandin. Çetinkaya axaftina xwe wiha domand: "Bêguman pêdiviya me bi Eniya Rizgariya netewa Kurdistan heye. Divê hemû hêzên Kurdistanê Bakur tevlihbûnê bibin." Ew dadixuyîna ku jî aliyê wan ve tu problem nîn e. Lê dema yekitiyê qewmî pêk neyê û xebat bi ser nekevin wê her tiştê wan dîsa li Ewropayê bimîne. Ji ber wê yekê jî Çetinkaya dixwaze ku ew di zûtirîn katê de berê xwe bidin welêt.

Nûnerê PRK-Rizgari Ferit Mirhaç:

### Divê dagirker vekişin

Li gorî nûnerê PRKRizgari Ferit Mirhaç jî gava platformê erênî ye. Ew diyar dike ku dê her dem yekitiyên bi vî rengî hem di asta bilind de hem jî ya nizim de destek bikin. Mirhaç diyar dike ku her çiqas platform kêmasiyan jî di nava xwe de bihewîne jî bo pêşketina çanda hevkarîyê wekî gaveke girîng e. Mirhaç li ser rûdanan wiha axivî: "Têkoşîna neteweyî gihîştîyê radeyekê divê ji aliyê herkesî ve bê fêmkirin û divê kes li gavên ji bo têkbirîna yekitiyê û aşîya nav kurdan nefikire. Divê platform têtîliya xwe bi hêzên li ser perçeyên din re jî bi pêş bixe. Divê li ser çareseriyê kêşeya civakî û etnikî ku jî ber penaberîyê diqewime jî programan çêbike." Her wiha Mirhaç diyar kir ku ew dixwazin dewleta tirk hem bi awayekî leşkerî hem jî siyasî jî Kurdistanê derkeve. Wî da zanin ku ew dê hewl bidin xwe da ku ev yek li ser qaxizan nemînin.

AZAD ALTUN

# Ji çend hêlan ve herêma Botan (1)

## Dar, ber û gihayên wê

### a) Dar û berên beji

Darên beji di nav çiya û newalên ku av lê peyda nabe de şin tê. Vê gavê werin em tevî taybetiyên wan, herin navdar û daristanan :

**Dara benê:** Bitmok û kizwan jê çêdibin. Ji bitmok û kizwanana rûn tê derxistin. Dema tê derzîkirin, dibe fîsteq. Her wiha "sabûne kizwana ku li Kurdistanê navdar e ji wê tê çêkirin.

**Dara berû:** palamut

**Dara tewê:** Fêkiyê wê şêrîn e. Tê xwarin. Bejn wê nîvçe ye. Pelên wê hûr in.

**Dara belalûkê:** Zêde ne bilind e. Bejna wê 1-2 metro ye. Fêkiyê wê tîrş e. Bi tenê biharê hêşin dibe. Di navbera 15-20 rojan de tê xwarin. Ji qevdikê destan ne stûrtir e.

**Dara kevotê:** Pelên wê hûr in. Wekî neynika destan e. Gewr e. Dema tê birîn dibiriqê. Bi kêrî mobilyayên gundan tê. Ji wê qelûn jî çêdibe. Zû bi zû naşewite.

wê kin e.

**Dara bînefs:** Gelekî zexm e. Bi kêrî xerad (marangoz) an tê. Destikên metqabê jê çêdibin.

**Dara mîwê:** Fekiyê wê tîrî ye. Ji pelên wê xwarina "eprax" çêdibe.

**Dara mişmişê:** Bilind û fireh e. Fêkiyê mişmiş jê çêdibin. Zemq jê dizê.

**Dara hilû:** Ne zêde dirêj e û ne jî kurt e. Fêkiya alûçe (erik) pê ve hêşin tê.

**Dara hejîrê:** Newqstûr e. Ji bo şe-

**Sûs:** Li ser şaxekê radibe. Mirov qeşilên wê diqêşirîne û dixwe. Ava wê bo tendurustiya mirov gelekî bi kêr e.

Ji herêmê navê çend giha û hêşinayên din:

Bazbask, şahfelanî, xûrnûf, gûhe reşk, karî, tîrşok, rezrûvik, xerdel, girêsk, penîrok, nokebeşk, pîrçelaç, ûrikê gê, kerbeş, bereqran, pişpijok, şoqil.

## b Gul û kulîlk

**Andeko:** Gelekî kurt e. Kulîlkê zer diavêje. Bi bêhn e. Şêr û şemalê wê wekî nefel ye.

**Nefel:** Kulîlkan di avêje lê zêde bêhn nade. Kurt e. Zer, sor, pembe û spî ye.

**Sîneme:** Kulîlkên wê zer in. Navê xwe ji jîrî keke pir bedew girtiye.

**Xecxecok:** Li erdê fireh dibe. Gelek çeqlî şaxên wê bi hewa dikevin. Pembe, sor û spî ye. Bêhn nade lê pir spehî ye.

**Bilbizêk:** Di dema zayîna pêz de çêdibin. Di wextê zayîna mihan de spî ye, di wextê zayîna bizinan de pembe ye. Zêde bêhn jê nayê. Pir xweşik e.

**Gangulok:** Koka wê biçûk e. Nava wê nêrî dide. Reng bi reng e. Bêbêhne lê pir spehî ye.

**Gihayê sêvan:** Gelekî bêhnxweş e. Dixine nava çayê. Hişk dikin û ji bo ku bêhna xweş têkeve nava malê bi qarçika xanî ve darve dikin.

**Pûnk:** Wekî nanê bibêhn e. Tê xwarin. Dermanê nexweşiyê ye.

**Kanêj:** Bêhna wê pir xweş e. Beriya ku pîr bibe tê qelandin û xwarin.


## Sewal û Lawir

**Sewalên beriyê:** Qozik, sivorî ziftik, gornebaş, keftar, piling kurbeşk, sîxûr, sêavk.

**Sewalên bi jehr:** Koremar, Tîremar, Mûka mara, Engebût, Şeqemal, Pijpijok, Marmarok.

**Teyr û tilûr:** Baz, bûm, kund, sîsî-yarkê keçel, kew, kevok, werdek, tivîlk, başok, kurtêserkelase, legleg-quling, bilbil, şalûl, kerek, şevşevok, xulk, hûdhûd, hachacik, meqesok, beytik, çinçinak, gabelek, dûvsork, qijik, qirxûk, pepûk, zertzûl, bet, dikê-porê, teyrikê, masiya, qaz, reşgê, barûtik, mirîşkbeşk, sûsk, û hwd.

BERHEVKAR: SALIHÊ KEVIRBIR



**Dara mazî:** Mazî pê ve şin tî. Berûyê sewalan jê çêdibe. Pê çerm tê terbiyekirin. Fêkiya sêvsêvok pê ve şin dibe.

**Dara êrvist:** Wekî dara çamê zû dişewite. Her gav bi pel û şîne e. Tê şewitandin.

**Dara Şirtê:** Zirav û kurt e. Di her demsalê de şin e. Jê sabûn çêdibe.

**Dara benav:** Gelekî bilind e. Dareke narîn e. Pelên wê hûr in. Gelek beriqok û spehî ye. Jê hesk û kevçiyên darîn çêdibin.

**Dara giwîjê:** Wekî hebên tîrî ne. Fêkiyên wê bi dendik in. Bi strî ye û zaf zû dişkê. Nazik e.

**Dara Kenêr:** Bejnîvçe ye. Rengê wê sor e. Gopalên spehî jê çêdibin. Pelên wê di nav avê de tê kelandin. Ji bo nexweşiyê baş e.

**Behîvajik:** Behîva beyanî ye. Dema hişk dibe nayê xwarin. Wekî qirşan e.

**Dara Şilanê:** Ev dar hem ter e hem jî hişk e. Ji xeynî Botanê li gelek herêmên Kurdistanê yê din jî şin dibe. Tê kelandin û vexwarin.

## b) dar û daristanên avî

**Dara gûzê:** Bilind e. Ji bo kişt û kala mobilyayê pir hêja ye. Jê qûntarên çekan; saz û tembûr çêdibin. Ji pelên koka wan boyax tê çêkirin. Ev boyax ji bo ta û rîs tê bikaranîn.

**Dara tûyê:** Ji fêkiyên wê darê dims çêdibe. Bi terî jî û hişkî jî tê xwarin. Ji şivên wê selik tîne çêkirin.

**Dara biyê:** Ter e. Zû bi zû nayê birîn. Li herêmê bi navê "dara arsız" jî tê nasîn. Kêranên avahiyên, dergûşên zarokan jê çêdibin. Bi fêkî ye. Bi tirkî jê re dibêjin "sögüt." Ji wê darê jî selik çêdibin.

**Dara bizû:** Pelên wê biçûk in. Bi fêkî ye. Gelekî spehî ye. Ji ber zexmbûna wê gopalên hêja jê çêdibin.

**Badarok:** Bi tirkî jê re "sarmaşık" tê gotin. Ji ber ku xwe badide û li dora xwe dizivire ev nav lê kirine. Li herêmê cihê werîs digire.

**Dara spîndarê:** Bejn zirav û bilind e. Bi tirkî jê re "kavak" tê gotin. Kêranên xaniyan jê çêdibin. Temenê

witandinê bi kêr e. Şîrê ku jê diherike wekî haveyn tê bikaranîn.

## Giha, hêşinahî û kulîlk

### a Yên ku tîne xwarin

**Kereng:** Koka wê di bin erdê de ye lê şaxên wê li ser erdê ne. Ji bo xwarinê tê kelandin û qelandin. Gewdeya wê dibe qîvar. Qîvar jî tê xwarin.

**Gûriz:** Koka wê ne stûr e. Bi pel e. Bi hêk û savarê re tê kelandin û qelandin.

**Tolik:** Bejn bilind e. Pel dide. Bi qoratan ve tê xwarin. Her wiha bi xavî û kelandî tê xwarin.

**Sûrim:** Di rengê sîrê de ye. Bi qasî metroyekê bilind dibe. Bi xavî û di nav hêkan de tê xwarin.

**Sîrik:** Koka wê kurt e. Du bihust bilind dibe. Dixin nav penêr.

**Reşad:** Giyayekî di rengê tûzikê de ye. Biharê hêşin dibe. Pelên wê hûr in. Tûj e. Hem kelandî hem xavî tê xwarin.

**Tûzik:** Pelên wê qalind e. Tûj e. Li ber avê hêşin dibe.

# Kurdî û zimanên îranî yên kevn

## Zimanê kurdî û avestayî

Zimanê kurdî zimanekî kevn ê îranî ye û lêzimê zimanên hînd-ewrûpî ye ku serçaviya wan, zimanên aryayî ye. Di vî warî de pisporê zimanê kurdî Edmonds dibêje: "Niha bi temamî ronî bûye ku zimanê kurdî zimanekî dewlemend û aryayî ye." Zanyarê bi navê "Son" ku demekê li Silêmaniyeyê jiyaye û zimanê kurdî fêr bûye, dibêje: "Li pey gotina gerokan, zimanê kurdî zimanekî dewlemend î aryayî ye ku ji hêla kurdan ve hatiye parastin." Her wiha Sir Sedîn Smith dibêje: "Zimanê kurdî zimanekî serbixwe û temendirêj e. Bi rastî em dikarin bibêjin ku zimanekî ji berdenivîsên Daryuş pir kevntir e." Doktor Blech dibêje: "Zimanê aryayî ew qas kevn e ku digihêje sanskrîtî û kurdî liqekî vî zimanî ye. Her wiha serçaviya zimanê kurdî medî ye ku Avestaya Zerdest Pêxember pê hatiye nivîsandin." Profesor Minorsky jî li dûv lêkolîneke dût û dirêj gihîştîye vê akamê (encam) ku zimanê kurdî xwediyê temenekî dirêj û zaraveyekî medî ye. Nêzikatiya zimanê kurdî digel zimanên îranî yên kevn gelek e. Li vir Minorsky bi peyva zimanên îranî yên kevn çêlî pehlewî û parsî dîke. Ew dibêje heke zimanê kurdî û ew ziman ne xwişk û birayê hev bin jî dotmam û pismamê hev in. Zimanê avestayî ev ziman e ku medî pê peyivîne.

Mamoste Merdox jî li ser heman

mijarê dibêje: "Zerdest zanayekî kurd bûye ku di sedsala 7'an a berî zayînê de banga xwedêperestiyê kiriye û bi zimanê herêma xwe pirtûka Avesta nivîsiye. Her wiha pirtûka "Zilal Zilal" ku pirtûkeke kurdî ya sedsala heştan e vê rastiyê ronî dîke.

Darmistre, Noldke û gelek ji rojhatnasan li ser vê baweriyê ne ku Zerdestê medî Avesta bi zimanê medî ango kurdî nivîsandîye û zimanê kurdî yê îroyîn jî ji serçaviya zimanê medî derketiye. Eger rojekê berdenivîsek li Hemedan a herêma kurdnişîn bê dîtin ev rastî derdikeve holê.

Ji bo ronîkirina vê mijarê em hinek peyvên kurdî ligel peyvên medî hevrû dikin.

**Penemosin:** nefes nekişandin, bêdengî

Ev peyv di kurdî de bi wateya ku li jor hate dikirandin, tê bikaranîn û ji du hêmanan pêk tê: penem+os. Li vê derê /-os/ paşgira e û bi wateya 1-bêdeng, 2-fermana bêdengbûnê û penem jî bi wateya nefes û henase hatiye bikaranîn. "Penem" di Avestayê de parçeyek e ku zerdestî di dema li dor êgir kombûnê de henaseya xwe girtine da ku hilma wan neçe agirê pak. Penem di zimanê yewnanî de jî henase ye. Ev peyv avestayî ye û wateya wê henase ye. Niha jî gelê herêma Bawecanî peyva penemos bi kar tîne.

Kon, kûn=reşmal, dewar

Kon ji kau-na ya îraniya bastan tê

û wateya wê qûl (kûr) û çal e.

**Hêşilan:** şûnemar

Heşilan navê cihekî ye li Hewreman ku gelê herêmê wekî cihekî ku lê mar pir in, dizanin. Ev peyv jî ji du hêmanan pêk tê: heşî+lan. Di nav kurdan de /-lan/ paşgira cihnişandêr e ku di peyvên kondelan û zerdelan de jî derdikeve pêşberî mirov. Lan di pehlewî de bi wateya kuna gwêç tê bikaranîn. Lê belê heştî peyveke pir kevn e ku "ejî" ya avestayî bi bîr dixe. Ejî di avestayî de bi wateya mar e. Di zimanên îranî û her wiha hînd û ewrûpiyan de /h/ û /s/ cihê xwe didin hev wekî hewreman û ewreman, enbane û henbane, hamûn û amûn.

Her wiha /j/ û /s/ jî cihê hev û du digirin wekî dujmin û duşmin. Xelkê hewreman îro jî peyva heşilan di wateya cihê maran de bi kar tînin. Ev yek jî nêzikatiya zaraveyê hewremanî û avestayî nîşan dide.

**Newal:** niwal, nihal

Peyva newal ji du beşan pêk tê. Ev peyv ji peyva "nav" an jî "naw" û paşgira /-al/ pêk hatiye. Peyva "Naw" jî têkildarî peyva "new" a îraniya bastan e ku wateya wê çal û nawdan e.

**Neqîz:** Darê nû ku hesinekî tûj bi serî ve ye.

Neqîz jî du hêmanan pêk hatiye "neq" û /-îze/, neq yan jî naq dirûvê kevn ê ney yan jî nay ye. Ji aliyê teşe û û peywîrê ve têkiliyêke pir nêzik a peyva "naq" ligel "nay şimşal" (bilûrê) heye.

Bi kurdî neq navekî kevn î avestayî ye ku kurd di peyva neqîze de bi kar tînin.

Medî	kurdî	farisî
ater	atir-agir	ateş
axiştê	aşt	aştî
ezim	ez	men
espe	esp	asb
ewre	ewr/hewr	abr
bexte	bext	bext
berz	berz	bilind
pirtû	pir	pîl
tem	tem	mîx
ce'ynî	jin	zin
dujenghe	doje, dozex	duzex
jinû	ejno	janu
raeçeh	roj	ruz
mawinge	mang	mah
mexşî	mêş	megs

## Kurdî û parsiya bastan

Zimanê kurdî digel zimanê fermî yê Hexamenîşî, wate zimanê parsiya bastan nêzikatiyek heye. Girîngtirîn serçaviya vî zimanî waneyêke Erdeşîrê sêyemîn e (358-338 P.Z) ku li ser berdenivîsên Hexamenîşî bûye. Ev berdenivîs li Kirmaşan ji ser Kewî Bestûn hatiye dozandin.

Parsiya bastan	kurdî	Farisî
awa	awa	çinan
ewepere	ewper	ansu
asman	asman	asman

esp	esp	asb
birzent	berz	bilind
zorkar	zorkar	zalim
fire	fire	firewan
k'ufe	kêf-kêw	kwe

## Kurdî û pehlewî

Zimanê fermî yê dema sasanîyan zimanê pehlewî bû. Bi vî zimanî gelek berhem li ber destan hene. Osman Nûrî Paşa dibêje: "Zimanê fermî yê sasanîyan zimanê pehlewî bû. Ew ziman dayika zimanê kurdî ye û zaravayê goranî dîmahîka vî zimanî ye. Bi gotina Gîw Mukriyanî: "Birek ji gelê kurdên lor, kelhûr û şiwani niha jî bi zimanê pehlewî qise dîke. Ev kelepora ku ji zimanê pehlewî maye nîşan dide ku tu cudatî di navbera kurdî û pehlewî de nîn e.

Em rastiya vê gotinê bi hinek peyvên pehlewî biselmînin.

**Beş:** sehim, qiset

Beş peyveke kurdî ye ku di pehlewî de jê re bexş hatiye gotin

**Xor:** hetav

Xor peyveke kurdî ye ku di pehlewî de jê re "xver" hatiye gotin.

**Dul:** fiqareke çermî yan jî hesinî ye ku pê avê dikişînin. Di zaraveyê lekî de "dul" tê kar anîn û peyveke bi kurdî ye û di pehlewî de jî jê re dul tê gotin.

Resen di kurdî de bi wateya esil û xwerû ye. Di pehlewî de jî bi heman wateyê tê bikaranîn.

Sur=Zemawend (zaravayê lekî)

Sura kurdî di pehlewî de jî bi wateya "cejn" û "zemawend" tê bikaranîn.

**Fire:** pir

Fire di kurdî de bi wateya pir tê bikaranîn. Di pehlewî de jî wateya wê pir e.

Pehlewî	kurdî	farisî
hamîn	hawîn	tabistan
ers	esr	aşk
birat	birra	birader
roj	roj	roz
kefçik	kefçik	qaşiq
pesî	pez, pes	gaw-gesfind
tem	tem	tarikî
tenê	tenê	tenha
tom	tom	toxm
dirozîn	dirozîn	diraxgu
roşin	roşin	ruşin
rist	rist	mirde
jin	jin	zin
sîp	sêv	sîb
kenik	kenîşk	dexter
giyan	giyan	can
wefr	wefr, befir	berf
hendam	endam	andam
yew	yew-co	cu
wehar	wehar	bihar
waran	waran-baran	baran
taşîten	taşîn	traşîden
tij	tij	tîz

EZÎZ MÎRADÎ, SIRWE-HEJM.145  
LÊANÎNA KURMANCÎ:  
SAMÎ BERBANG

MAHMUT KILINÇ



Nivîskarê me wê  
ji ber persgirêka  
tendurustiya xwe  
bo demekê  
nenivîsîne.

*Jîna ji navenda sîstemê heya şehadetê:*

# Hevalê Reşo

**H**evalê Reşo dema zarok bû, her tim li çirokên dayika xwe yên li ser Komkujiya Geliyê Zilanê guhdarî dikir. Ew, li ber dengê dayika xwe ya biêş û jan mezin bûbû. Dema dayika wî diçû bêriyê, Reşo jî bi xwe re dibir. Ku digihîştin Geliyê Zilanê lê dîsekini û digot: "Lê binêre Reşo! Kurê min, di van şkeftan û newalan de leşkerê Romê bi sedan jin û mîr, ku serî hildabûn, dane ber sîngiyên, dane ber berikên tiwîngan. Çemê Geliyê Zilanê bi rojan xwîn herikî."

Diya Reşo dawiyê kesereke kûr dikeşand û digot: "Xwezî zimanê Çemê Zilanê hebûya, serpehatiya xwe bigot!" Peyre destên xwe diavêtin çavên xwe û berê xwe diguhart, da ku Reşo hêstirên wê nebîne. Piştî jî destê xwe hişk diavête destê Reşo, dişidand û digot: "De lez ke! Em jî bêriyê dereng man."

Di ser re sê sal derbas bûn. Hevalê Reşo zewicî û bû xwedî zar û zêç. Wî, dengê dayika xwe ya bi kul û keder û Geliyê Zilanê jî bir kiribû. Reşo jî mîna bi hezaran kurdî berê xwe da metropolên dagirkeran û dest bi taşeroniyê kir. Lewre jî nasnava xwe ya netewî dîr ketibû û jî xwe re bûbû biyanî. Êdî ketibû taya dewlemendî û tirkbûnê. Her ku diçû di fikra xwe de hinekî dîn nêzikî xevalên xwe dibû. Çimkî ew, êdî bûbû taşeron û wî gelek xortên kurdan kişandin navendên dagirkeriyê. Van kesan bi erzani gelek xortên kurd dixebitandin.

Salnameyê roja 15 gelawêjê sala 1984'an nişan dida. Raperîna bi nav û deng Raperîna 15 Gelawêjê pêk hatibû.

Hevalê Reşo li ser van rojan wiha diaxivî: "Dema min ev derbeya ku li



Hevalê Reşo (Eyüp) li gundê Eksê bi ser navçeya Wanê Erdîşê jî dayik bûye. Ew, di sala 1991'an de beşdarî nav refên gerîla dibe û di sala 1994'an de jî tevî karwana pakrewanan dibe.

dijmin hatibû dayin, bihîst, ew dengê rehmetiya dayika min ya bikul û keder, di guhê min de olan dida û hêstirên we yên jî bo Terteleya Geliyê Zilanê dihatê bîra min. Wê demê di kûrahiya dij û mējiyê min de şahî û daxwaza tohildanê peyda dibû."

Ji vê rojê û şûn ve jî Hevalê Reşo jî dîr ve bala xwe dide ser PKK'ê û di sala 1990'î de êdî ew dibe progandîstekî xwezayî. Di vê demê de gerîla dikevin herêma Serhedê jî û çalakîyan li dar dixin. Ji ber vê hindê Hevalê Reşo li ser hev tê Kurdistanê û demeke dirêj lê dimîne. Li der dora xwe wekî welatparêz tê naskirin. Lewre hêdî hêdî li rastiya

xwe vedigere. Êdî di giyan û ramana wî de vegera çavkaniya neteweyî dest pê kiriye. Lê belê ew bê rêxistin e. Çi, wê çawa bike, hîn başbaş tenegehîştîye. Lewma di warê tekoşînê de tişteki berbiçav nake. Bi vî awayî heya sala 1991'ê jiyana xwe diborîne.

Hevalê Reşo dema dijminê faşîst jî bo ku gundî bibin cerdevan zorê dide wan, bi lez vedigere welêt û da ku nehêle gundî cerdevaniyê qebûl bikin. Lê tevî hemû hewl û xebatê wî, hinek gundiyan wî yên "xayîn" qayil nabin û dibin cehşê dewleta Romê. Hevalê Reşo bi vê yekê gelekî diçe û hîlnagire. Ev yek pir li zora wî diçe û ew dibêje


qey li vê derê jî îxanet care ke din bi ser ket.

Ev bûyer dike ku Hevalê Reşo bikeve nava mital û fikaran. Bi rojan li ser çareseriyê difikire. Dawiyê digihêje merhela biryargirtinê. Li aliyekî welatê wî, li aliyekî îxanet, li aliyekî malbat û zarokên wî, li aliyekî jî dijminêkî hov û har heye.

Hevalê Reşo êdî wê bike lêhm dike û digihêje wê baweriyê: Heya dijmin jî Kurdistanê nayê qewirandin, wê îxanet hebe. Her wiha dibîne ku dema welatê wî di bin dagirkeriyê de be, girîngiya malbat û zarokên wî jî tuneye. Piştî vê pêvajoyê di sala 1991'ê tevî refên gerîla dibe. Berî ku biçe nav refên gerîla çekên xwe girê dide û êrişî ser cerdevanên gundî dibe. Di encama vê êrişê de sercerdevan dimire û gelek cerdevan jî birindar dibin.

Piştî vê çalakîyê Hevalê Reşo li Çiyayê Tendûrekê xwe digihîne gerîlayan. Ev çalakîya Hevalê Reşo ya li dijî cerdevanan û ketina nav refên gerîla, bandoreke mezin li herêma ku ew lê maye dike. Dilsoziya Hevalê Reşo ya ji bo welêt, partî, pêşengiya partiye û hevalan gelekî xurt e. Her wiha kin û gura wî ya li dijî dijmin jî her gur bû. Cihê ku ew lê heye dilgeşî û moraldarî rû dide. Hevalê Reşo jî ber jêhatibûn û şarezabûna xwe ya di warê leşkerî de, di demeke kin de payeya serleşkeriyê wêrdigire.

Di bihara 94'an de dijmin êrişêke giran dibe ser Çiyayê Tendûrekê. Li ser vê yekê gerîla derbasî cenga tevgerî ya çalak dibe. Hevalê Reşo dîsa di kemîna herî pêş de, mîna teyrê baz êrişî ser dijmin dibe. Her ku şer berdewan dike kuştîyên dijmin zêde dibin. Lewre dijmin dîn û har dibe. Mîna wehşan bi her awayî hem li erdê û hem jî di hewayê de dest bi êrişêke dijwar û berfireh dike. Dijmin bêwestan û rawestan Tendûrekê bombbaran dike. Li Çiyayê Tendûrekê di nava wî agirê dijwar de Hevalê Reşo qet naweste û sekin pê nabe. Geh li vî milî geh li wî milî hem şer dike û hem jî hevalan di çeperên stratejîk de bi cih dike. Hevalê Reşo di dema pevçûnê ya herî giran de dixwaze ku cihê xwe biguhere. Ji kozîka xwe radi-be ser xwe. Ew cara dawî bû ku li ewrên serê Çiyayê Gilîdaxê nihêrî.



Abdurahman Sögüt

**Özgür Çınar** di 11'yê Kewçêra 1992'an de li navçeya Kızıltepeyê, li dora gundê Xursê bi çar hevalên xwe re di şer de şehîd ket.

**Abdurahman Sögüt** di 18'yê rêbendana 1992'yan de li Nisêbînê bi kiryar nediyar hat qetilkirin.



Özgür Çınar

**Li ber şhadeta wan em serê xwe bi hurmet ditewînin  
Li ser navê malabata wan Horî Sögüt**

## Azadiya Welat kete sala xwe ya 4'an

Rojnameya hefteyî Azadiya Welat, roja 21'e rêbendana 1996'an de dest bi weşana xwe kir. Bi zaravayên kurdî kurmançî, soranî û dimilkî nivîsan diweşîne. Heta niha ligel gelek cezayên li ser nivîs û wêneyên hatine bikaranîn, ji bo sê hejmarên wê cezaya berhevkirinê derket. Gelek xebatkarên wê hatin binçavkirin û girtin. Niha li Amed, Îzmîr, Edene û Mîrsîn çar nûnerîyên wê hene. Ji roja 12'ê kewçêrê bi vir de ketina wê ya 'Herêma Rewşa Awarte' hatiye qedexekirin û hîn jî dom dike.

## BÛYERINE JI DÎROKÊ




□ Rêbendan 1921:

### Mustafa Suphi

#### tevî 15 hevalên xwe hatin xeniqandin

Serokê Partiya Komûnîst a Tirkîyeyê (TKP) Mustafa Suphi tevî 15 hevalên xwe di Derya Reş de bi awayekî xiniqî hatin xeniqandin. EV, ji bo ku beşdarî şerê Rizgariya Tirkîyeyê bibin dihatin Eneqereyê. Lê kemalîstan nedixwest bandora komûnîstan di nav şer de zêde bibe.

## ÇAVDÊRÎ



## Helbest

SERKAN BRÛSK

Li hemû deverên cîhanê, edebiyatê bi helbestan dest pê kiriye. Helbest koka edebiyatê ye. Hemû berhemên din ên edebî li ser helbestê gewde û şax dane, pel li guliyê wan ketine. Ji bo dara sêvê mîweya wê çî be, ji bo wêjeyê jî helbest heman tişt e. Dîsa ew gula dargulê ye.

Peyvên xweş li ber muzîkek guncaw bi devê kesekî/ê ji bo guhdaran hatiye gotin. Em li vir dibînin ku helbest esasê stran û kilaman e jî. Serkaniya wan a herî bi xêr û bêr e. Mirovan deriyê cîhana xwe ya hundir, ji van peyvên ku pê li damarê herî hesas ê hestên wan dikin, heta dawiyê vekirine. Mirov dikare bêje, vê beşa edebiyatê ya herî bedew û lihevhatî, tu endamên çîr û qastên ku li ser esasên jiyana madî hatine dayîn, nas nekiriye, xwe berdaye nava hestên wan. Wekî hewa, avê û roniyê xwe li hemû mirovan belav kiriye.

Di hemû deman de ji xwe re rê peyda kiriye û derbasî dilê mirovan bûye. Helbest jî vê awirê ve dermanê dil e ku dil bê wê nikare bijî.

Şaîr jî hemû mirovan bêtir nêzikî dilan in. Nêzikî peyvan in. Rastgoyên hunerê ne. Peyvek wan jî hebe, ji dil û can e. Dûre peyv di destên wan de bi ser û ber dibin. Bi pênuşa wan jî bêmirin dibin.

Şaîr e yê ku wekî ronîya çavên xwe li peyvan dinêre. Peyv bi pênuşa ji dilê wî dibin xwedî hêjahî û rûmeta wan bilind dibe.

Çawa ku keviyek telomelo û gincirî, yan jî darekî ku ji sobeyê pêve ji tu tiştêkî din re nabe, di nava destên heykeltiraş û necaran de bi formkirineke hunerî estetîze û bedew dibe, bi pênuşa şaîr peyv jî bi bedewtirîn awayî tê xemilandin, wek ciwantirîn diyarî bo giyan tê pêşkêşkirin.

Li vir divê em zanibin ku giyan ji jiyane bixwedî dibe. Peyva ku li vir ji bo giyanê tê pêşkêşkirin ne wekî bûkeke naylonî ku fabrikasyon e, na, peyva ku em behs dikin ji hestên ku pêvgirêdana wan bi xurtirîn awayî bi jiyane re heye bi xwedî dibe, bi laş dibe û dibe wekî bûkeke roneditî.

Çawa ku dîmenekî bajarê helepçe û Zerdest bi boyax û firçeya şewekarekî li ser tabloyekê berdewam bibe stîrî û di giyana yana mirovahiyê rabe, ha wisa jî êşa van bajaran divê bi peyvê heman dewrî bileyize.

Evîn, kîn, êş, şîn, xweşî û nexweşî, bedewî û çortî ev hestên şaîr ku ji serkaniya dilê şaîr dizên bi peyvên wî yên bijarte di hingivin cîhana hestên me. Carinan vê cîhanê ji binî ve dihejin.

Şaîr mamosteyê giyanan e. Wan bi peyvan perwerde dike.

Helbestvan e yê ku herî zêde dikare danûstandinê bi cîhanê herî weşartî yên mirovan re dayne.

# Jinên kurd Roza Luksembûrg bi bîr anîn Ji bo jinê şexsiyetek mînak

## Roza Luksemburg kî ye?

Roza Luksemburg di sala 1871'ê de li Polonyayê hate dinê. Ji ciwantiya xwe de di nav rêxistinên sosyalîst de cih girt. Piştî derkete Ewrûpayê jî têkoşîna xwe berdewam kir. Li Almanyayê di nav Partiya Sosyal-Demokrat de cih girt. Di vir de jî, li dijî şexsiyet û serokatîyên revîzyonîst ku di gotinê de markîst lê di pratîkê de ne wisa bûn, têdikoşiya. Têkoşîna wê ya li dijî hikûmeta Almanyayê ku ji sosyal-demokrat pêk dihat, bû sedema qetilkirina wê.



kin, bibin jinên ku tînin zimên û di-axivin jî."

Li ser navê ÖKD'ê Fatma Kara û li ser navê EKB'ê Nuran Yazıcı jî şexsiyeta Roza û pratîka wê ya di têkoşer ji aliyê jinê ve nixand û fikrên xwe anîn zimên.

Fatma Kara li ser mînakgirtina pratîka Roza Luksemburg ji aliyê jina kurd ve rawestiya û xalên girîngberbiçav kirin. Kara wiha desnîşan kir: "Roza Luksembûrg xwediyê şexsiyeteke bi îdia, bi biryar, berxwedêr bû. Em di van waran de tenê di pratîkeke hemalwarî de ne. Em tiştên tînin gotin dikin, bi cih tînin, le di qerar standinê de, di afirandina tiştinan de û nivîsandinê de em tîra xwe nakin, em zêif in. Em jî îfadekirina pratîka xwe direvin. Di vî warî de dîsa Roza şexsiyeteke mînak e."

Nuran Yazıcı bi giştî jiyana wê ji destpêkê heya qetilkirina li ber çavan kir. Yazıcı wiha got: "Wekî hemû penaberên polîtîk ên polonî Roza jî piştî penaber bûye, li deverên ku çûyê têkoşîna xwe berdewam kiriye. Di nav rêxistinên van deveran de cih girtiye û têkoşîna ji bo Polonyayê ji bîr nekiriye li ser navê welatê xwe ketiye civîn û konferansên navneteweyî."

### Siyasibûyîna jina kurd

Dîsa li sar navê Komîsyona Jinan a HADEP'a Stenbolê ya navendê Nurhayat Altun, li ser mînakgirtina şexsiyet û çalakiyên ku bûne malê dîrokê rawestiya û rastiya jina kurd destnîşan kir. Nurhayat Altun bal kişand ser şexsiyetên dîroka duh û îro. Wê şexsiyetên di berxwedanên Dêrsim û Koçgîrî de cih girtine, yên wekî Besê û Zarîfe bi bîr anîn û got ligel ku ne di têkoşîna jinê de ye jî, ev welatparêzî ye. Da zanin ku wan jî ber rewşa xwe ya eşîrî û feodal li cem mîrên xwe cih girtiye, bedena xwe daniye meydanê û bûne malê dîrokê.

Altun her wiha asta jina kurd a îro jî nixand û bal kişand ser rewşa siyasibûna jina kurd. Altun wiha got: "Jina kurd ji ber rewşa feodal her tim li paş maye. Lê bi pêsketina têkoşîna neteweyî jina kurd li ber deriyê girtîgehê de ji bo serlêdanê, di îşkenceyan de siyasibûnê dijî û hîn dibe. Jinê bi vî awayî bi şer siyasî nas kiriye. Ji bo vê Leyla Zana mînakek e. Ew jina kurd temsîl dike û îro jî aliyê hemû dinê ve tê naskirin. Îro têkoşîna neteweyî ya jina kurd dikare jinên din ên cîhanê jî bi rêxistin bike. Înternasyonalîst e. Eva Junke û Andre Volf jî bo vê mînakên berbiçav in."

AZADIYA WELAT/ STENBOL

Di dema Şerê cîhanê yê yekemîn de hukûmeta Almanyayê ku ji Sosyal-Demokrat pêk dihat, ji parlamenterên Almanya xwest ku ji bo şer bacê veqetînin. Lê maneya vê yekê, hevkarîya împeryalîstan û li dijî çîna karker îxanet bû. Roza bi tundî li dijî vê kirinê derket, her wiha piştî vê tevî hevalên xwe yên marksîst ji Sosyal-demokrat veqetiya û komek cuda ava kir. Dû re ev kom wekî Spartakîstan hate nasîn. Roza Luksemburg piştî vê yekê, tevî hevalên xwe girse li dijî împeryalîstan birêxistin kir û li dijî vê hikûmeta revîzyonîst, meş, mitîng li dar xistin. Piştî mitîngêk bi vî rengî Roza Luksemburg tevî hevalê xwe yê ji heman fikrê Karl Liebknecht hate girtin. Ew roja 15'ê rêbendana 1919'an ji aliyê hukûmetê bi navekî din, ji aliyê faşîstên alman ve hatin qetilkirin.

Bi pêşengiya Komîsyona Jinan a HADEP'ê bi boneya salvegera Roza Luksemburg bi hevkarîya Komeleya Jinên Kedkar (ÖKD) û Yekîtiya Jinên Kedkar (EKB) li HADEP'a GOP'ê panel hate lidarxistin. Panelîstên jin, derbarê girîngiya şexsiyeta dîrokî ya Şoreşgera Polonyayî Roza Luksemburg de dîtin û ramanên xwe vegotin.

### Pêwîst e em bibin jinên ku diaxivin

Ji Komîsyona Jinan a HADEP'ê Nivîskar û weşanger Aysel Nur Zarakolu şexsiyeta birêxistin, biryardara Roza Luksemburg ji beşdarên re vegot û fikir û ramanên xwe anîn zimên. Zarakolu got ku di nav jinên kurd de mînakên wekî Roza, pir in lê bi cûdatiyekê. Zarakolu ferqa di navbera Roza û jinên kurd de wiha destnîşan kir: "Jinên kurd ên têdikoşin fedakar in, di riya xwe de biryardarin, canê xwe di ber doza xwe de didin lê, afirandin nîn e. Em derdikevin kolanan, beşdarî protestoyan dibin lê, em van kirinan ne bi îradeya xwe, bi rênîşandayîna kesek din pêk tînin. Divê em bibin ne tenê jinên tenê protesto di-

# Nivîskar û lêkolînerê kurdolojiyê Mehmet Bayrak Komara Tirk ji darizandi

**W**e tirkoloji xwendiyê, lê niha jî em dibînin pirtûkên we li ser kurdolojiyê hene, yanî we di destpêkê de tirkoloji xwend û peyre li ser kurdolojiyê nivîsand. Sedema vê çi bû?

□ Min tirkoloji xwend lê peyre jî ez li ser kurdolojiyê rawestiyam. Eleqeya min bi kurdolojiyê re di sala 1970'yê de çêbû. Yanî wê demê di "Özgürlük Yolu"yê de, bi navekî din gelek nivîsên min hatin weşandin. Heta didu ji wan nivîsan bi navê min ê rast, li ser kurdolojiyê di Kovara "Özgürlük Yolu"yê de hatin weşandin. Lê di vî warî de daxwaza nivîsandina pirtûkan piştî sala 1980'yê bi min re çêbû.

**Kîjan salan hûn di TRT'yê de xebitî? Hûn dikarin hinekî çêlî dema ku hûn di TRT'yê de wekî nûçegihan dixebitî, bikin?**

□ Ji sala 1974'an heta dawiya 1981'ê. Lê di 1981'ê de, cûnta leşkerî 101 kesên demokrat û pêşverû ji wezîfeyê avêtin û yan jî şandin saziyen din. Ji vê komika me ya ku ji TRT'yê hate derxistin re komika 101'ê dihate gotin.

**Hinek berhemên we li ser elewî û kurdan hene. Dema we di vê babetê de dest bi nivîsandinê kir, armanca we çi bû?**

□ Di hemû berhem û nivîsên min de pîvanek heye. Ji kîjan, ol, mezheb, nîjad û neteweyan dibê bila bibe min herdem cihê xwe li gel mirovên kedkar girtiye. Ya duduyan û ya herî girîng ji ber pirsgerêka nasnameyî min cihê xwe li ba gelê kurd girt. Cihê ku gelê kurd mîna kêmeteweyan tê dîtin; yanî li Tirkiye di warê bawariya olî de, ya he-

ri hejmar kêmeteweyan e, yanî çawa ku kurd li Tirkiyeyê kêmeteweyan sereke ye, civaka elewîyan jî, di nava wan de ya herî hindik e. Çawa ku dewlet ji bo berevajîkirina rastiya kurdan ketibe nava hewldanan, ji bo elewîyan jî berê xwe daye rîyeke wisa. Ez dixwazim rastiya vê derxînim holê. Bi pirtûka xwe ya bi navê "Aleviler ve Kürtler" min xwest wan li ser piyan bigirim.

Ji ber ku bi taybetî di dema İtihatçıyan de, elewî di nav bektaşîyan de, wekî tirkên misilman hatine nîşandayîn. Di vê mijarê de pir tezên şaş pêk hatine. Elewî mîna tirkên misilman hatine nasandin. Ya rast elewîti ne mezhebeke tirkan ne jî mezhebeke îslamê ye.

Ya duduyan me kurdan, ne ola xwe û ne jî, erdnîgariya xwe baş zanibû. Îdeolojiya fermî elewîti bi tirkîtiyê ve û şaftî ango sunîti bi kurdîtiyê ve girêdida. Halbûkî yek ji wan neteweyî ye û ya din jî, olî ye.

**Gelo çima rejîm ji hinek elewîyan re qizilbaş dibêje û ji hinan re jî, elewîyên tirk dibêje?**

□ Tiştê ez jî dixwazim bêjim ev e. Jixwe di dîrokê de, bi navên cuda her tim xwestiyê elewîtiyê şaş bide ragihandin. Di serê sedsala 20'an de gotina elewîtiyê derketiye û ketiye nav lîteratûrê. Beriya wê gotina elewîtiyê nîn e. Çi heye wê demê? Bi zimanê tirkî qizilbaş heye û bi zimanê kurdî "ser-sor" heye. Yanî peyva elewî di serê sedsala 20'an de, di serdema İtihatçıyan de derdikeve meydanê. Vê ji xwe re dikin hincet. Armanca wan ew e ku vê baweriyê, vê olê nêzikî misilmaniyê bikin û ji ber wê ev yek çêdibe. Ez niha jî ber vê sedemê, li ser elewîtiyê disekinim û dixwazim

vê yekê bi awayekî zanistî derxînim holê.

Yanî min xwest bêjim li Kurdistanê çavkaniyên baweriyê û çandê çi ne? Îro li Kurdistanê, Mezopotamyayê, Anatoliyê ev baweriyên ku jê re dibêjin ol, berfireh e, ez lê guhdar dikim, heta ku ez dibêjim ol, ew tiştêkî din e. Esas bingehên vê çavkaniyê, vê baweriyê, vê olê û felsefeyê, çi ne û ji ku tên? Têkiliyên wan bi baweriyên kurdan ên kevin re çi ne? Ev çiqasî ketiye bin bandora îslamiyetê û baweriyên din? Piştî kurd çawa li vê baweriyê dinêrin, yanî elewîti di nava kurdan de çawa tê xuyakirin û di nava tirkan de çawa le tê nêrin. Wekî din di nava ereban de, çawa xwedî bandor e. Li aliyê din baweriyên kurdan ên ku em ji wan re dibêjin "Heteretodoks". Yanî elewîti, qizilbaşî, ehliheqî, êzdîti û kekeîlik... Min xwest ez aliyê van baweriyên ên hevpar û din derxim meydanê. Min xwest bidim îspatkirin ku bingeha vê baweriyê ji olê Arî derdikeve û ji çanda kurdan a kevnar tê. Di nava hinek civakên din de, cuda hatiyê nixrandin. Yanî bi kurtasî ezê vê bêjim: Civaka kurdan, wekî civakên din ne homojen e. Yanî neteweya kurd ji aliyê bawerî û çandê ve jî, civakêk pir dewlemend e. Nihâ di nav de elewîti heye, ehliheqî heye, êzdîti heye, misilmanî heye. Heta tarîqatên ku kur-

Heta niha rewşenbîrên kurd, Tevgera Rizgarîxwaz a Kurd bi riyên demokratîk çi kiriye û xwestiyê çi bike? Ji notên ku dane hikûmetên tirk, ji nameyên ku hatine şandin û broşûrên ku heta niha hatine amadekirin, pêk tê. Yanî ji duh heta îro dîplomasiya kurdan. Beşeke girîng e ji bo dîplomasiya kurd.

dên sunî bi wan re ne ji yê din cuda ne.

**We bi çi sedemê dev ji tirkolojiyê berda û kurdoloji nivîsand?**

□ Dîsa pirtûka min a bi navê kurdoloji ku ji belgeyan pêk tê, di nava berhemên min de yek ji yên ku hatine berhevkerin û cezakerin e. Ev xebata min li ser sê esasan pêk hatiyê. Beşa yekem; ji bo rewşenbîrên kurd ku îro nîvdîplomasiyê dimeşînin pir girîng e. Yanî heta niha rewşenbîrên kurd, Tevgera Riz-



## jinênîgarî

Mehmet Bayrak di sala 1949'an de li Anatoliya Navîn, ji dayika xwe bû. Di 1970'yê de xwendina xwe li ser tirkolojiyê qedand. Xebatên wî yê berî niha bi giştî li ser tirkolojiyê bûn. Di sala 1973'yan de pirtûka wî ya bi navê "Tevfik Fikret Devrimi" hate weşandin. Piştî bi taybetî li ser wêjeya devkî û ya hemdemî, rawestiya. Di sala 1978'an de, bi navê "Hozan û nivîskarên Înstîtuya Gundan" berhemêke wî ya antolojîk hate weşandin. Ev xebat ji bo kurdan, bi taybetî di edebiyata tirkan a hemdemî de xebateke pîroz bû. Ji ber ku pîraniya nivîskarên Înstîtuya Gundan kurd bûn û bi giranî li ser Kurdistanê û erdnîgariya Kurdistanê dinivîsandin. Paşê di wê demê de wexta ku ev xebat dikirin, hinek nivîs li ser pirsgerêka kurdan jî, di kovara "Özgürkük Yolu" yê de dinivîsandin. Lê wê çaxê wî nûçegihaniya TRT'yê dikir.

Bi salên 1980'yê re dest bi xebatên li ser hinek taybetiyên hevbeş ên dîroka kurd û tirkan kirin. Di pirtûka bi navê "Tevgera Gel û Destana Hemdem" de li ser tevgerên ku gelê kurd û tirk bi hev re dabûn destpêkirin nivîsand. Piştî bi navê "Rêbirî û Tirkên Rêbir" lêkolîneke antolojîk weşand. Her wiha li ser çanda elewîtiyê û serhildanan jî, xebatên wî çêbûn û piştî jî bêhtirîn li ser kurdolojiyê rawestiya. Esas tîkildariya wî ya bi kurdolojiyê re ji salên 1970'yê ve dest pê dike, lê bi taybetî kûrbûna wî ya li ser kurdolojiyê ji sala 1980'yê vir de çêbûye.



# k: nê ditirse

garîxwaz a Kurd bi riyên demokratîk çî kiriye û xwestiye çî bike? Ji notên ku dane hikûmetên tirk, ji nameyên ku hatine şandin û broşûrên heta niha hatine amadekirin, pêk tê. Yanî ji duh heta îro diplomasîya kurdan. Beşeke girîng e ji bo diplomasîya kurd. Ev beşa yekem e. Beşa duwem jî, ji raporên ku bi dizî li ser kurdan û elewîyan hatine amadekirin, pêk hatiye.

Bêguman ev rapor ji aliyê rewşenbîrên nêzîkî dewletê ku li ser kurd û elewîyan xebatê dikin ve hatine amadekirin. Piraniya van raporên ji aliyê berdevkê Atatürk Hasan Raşit Tankut ve hatine amadekirin. Prof. Hasan Tankut, piştî têkçûna serhildana kurdan a sala 1925'an wekî Muşawîrê Asayî yê Kurdistanê (Şark Asayîş Komutanî) yanî bi navê "Kürdistan Müşavîrî" diçe Kurdistanê. Di heman demê de, ev kes ji bo aşîmîlekîrîna kurdan di nava tevgerê de hatiye wezîfedarkirin. Dîsa wê demê ji bo tirkîrîna kurdan jî, wezîfe hilgirtîye ser milên xwe. Bi taybetî ew der barê kurdan de, raporên amade dike. Wî ji sala 1927'an pê ve bi awayekî sererast der barê kurdan de, rapor amade kirine. Bi vê tenê jî nemaye wî, li pey hev der barê ol û baweriyên kurdan de, bi dizî rapor nivîsandîne û pêşkêşî hikûmeta kirine.

Ev beşa duduyan, bi taybetî ji belge

û raporên rewşenbîr û şexsiyetên ku ji dewletê re şewirmendî dikirin, pêk tê. Di serî de ji belge û dokûmentên Hasan Tankut û gelek rewşenbîrên tirk ên ku di nava dewletê de xwedî cihêkî girîng bûne, pêk tê. Ji ber vê yekê pir girîng e.

Yeke din ji nivîsên min ên ku berî niha bi periyodîk di weşanên cur bi cur de, di warê kurdolojiyê de hatine weşandin ên ku di pirtûka min a sîsiyan de cih digirin, pêk tê.

**Di çapemeniyê de her çiqas nehati-be diyarkirin jî, tê gotin ku li ser pêşniyaza Özal û hinek derdorên siyasî, PKK'ê agirbest îlan kiriye, hûn li ser vê çî dibêjin?**

□ Rast e, rast. Jixwe ez wê dibêjim. Tiştêkî wisa di nava dewleta tirk de hebû, wê dixwest. Yanî bi agahiya Özal agirbest pêk hat. Êdî kurdan jî, fam kiribû ku şer ne ji bo kara wan e jî, bi rîya Turgut Özal dewlet jî, ji vê yekê haydar bû. Bi zanebûna dewleta tirk ev agirbest pêk hat. Lê wekî ku min got, piştî ku agirbest ji aliyê hinek mirovên şerxwaz û milîtarîst ve hate xerakirin rewşeke pir dijwar dest pê kir. Lê di warê progandayê de, dewlet bi ser ket. Ji ber ku li gorî dihate xuyakirin agirbest ji aliyê kurdan ve hatibû xerakirin. Dewleta tirk jî, ev yek ji xwe re wekî propagandayekê bi kar anî.

Di sala 1991'ê de, pêşniyazê Özal hebû, ez bawer im di kovara 2000'ê Doğru de, hatibû weşandin, digot ji bo kurdan divê muxtariyek bête dayîn. Di pêvajoya agirbesta PKK'ê ya 1993'yan de, Özal wiha got: "Pêwîst be heta bi federasyonê jî divê em nîqaş bikin." Her wekî tê zanîn herkes dizane ew ji holê hate rakirin. Heta ji aliyê gelek mirovan ve hate gotin ku ew ji aliyê MIT'ê ve hatiye kuştin. Mirov dikare bibêje ku niha dewleta tirk li Özal digere?

Li ser kuştina Özal gumanên mezin hene. Yanî em bêjin li ser mirina wî gumanên cidî hene. Bi destê hin kesên milîtarîst ên di nava dewletê de hate kuştin. Yan jî, wekî ku tê îdiakirin. Lê di vî warî de pir guman hene. Esas bûyer ew e. Turgut Özal tevî van politîkayên şaş jî, ev didît ku heta pirsgrêka kurdan çareser nebe, li Tirkiyeyê demokrasî ne mimkûn e, pêşveçûna Tirkiyeyê û heta pêşveçûna Rojhilata Navîn jî, ne mimkûn e. Ji ber ku ev yek didît bêhtir bi rasteqînî dixwest nêzîkî meseleyê bibe. Got divê ev were nîqaşkirin. Armanca wî di nava sînorê Tirkiyeyê de peydakirina çareseriyekê bû. Heman tişt Murat Karayalçın jî got. Yanî fikra federasyonê jî di nav de divê ev mesele were guftûgokirin. Piştê he-

Beriya wê gotina elewîtiyê nîn e. Çi heye wê demê? Bi zimanê tirkî qizilbaş heye û bi zimanê kurdî "sersor" heye. Yanî peyva elewî di serê sedsala 20'an de, di serdema Îfîatçiyân de derdikeve meydana. Vê ji xwe re dikin hincet. Armanca wan ew e ku vê baweriyê, vê olê nêzîkî misilmaniyê bikin û ji ber wê ev yek çêdibe.



Lê tevî van hemû rûdanan jî, ev pêvajoyê wê qozên di destê leşkeran de, ji destê wan bigire û wê dewleta tirk jî bixe tengiyê. Ji ber vê yekê, Ecevitê ku ji bo serokwezîrtiyê hatiye wezîfedarkirin, dibêje; "Esas ji bo Tirkiyeyê niha rojên dijwar dest pê dikin" ji ber ku qozên di destên milîtarîstan de, wê ji destê wan derkevin.

man nêzîktêdayîn ji aliyê hinek kesên din ve jî, hate pêşniyazkirin.

**Ev şexsiyetên wekî Karayalçın û Özal mirovên dewletê ne, lê ji ber gotinên wan ên der barê kurdan de, ji wezîfeyê têne dûrxistin û yan jî têne kuştin. Kî wiha li wan dike?**

□ Ev yek vê dide nîşandan: Di nava dewletê de, hêzên milîtarîst li hemberî yên sîvil çiqasî xurt in. Jixwe van demên dawî çetebûn jî, dide xuyakirin, ka bê çiqasî ev hêzên milîtarîst di nava dewletê de, xwedî hêz in. Lê tevî van hemû rûdanan jî, ev pêvajoyê wê qozên di destê leşkeran de, ji destê wan bigire û wê dewleta tirk jî, pir bixe tengasiyê. Wê ji bo çareseriyê siyasî zorê li wan bike. Ji ber vê yekê, Ecevitê ku ji bo serokwezîrtiyê hatiye wezîfedarkirin, dibêje; "Esas ji bo Tirkiyeyê niha rojên dijwar dest pê dikin" ji ber ku qozên di destên milîtarîstan de, wê derkevin. Çima? Ewrûpa ji alîgir e, nîzanim Amerîka jî alîgir e, dawîya dawî ji bo çareseriyê siyasî Tirkiye wê bikeve nav rewşeke dijwar, wekî din tu rê nîn in.

**Tam di vê demê de ku dewlet dibêje PKK qediyaye, em dibînin ku li başûrê Kurdistanê firokeyên wê yên ku êrîşê dibin ser gerîlayên PKK'ê, têne xistin. Li gor we divê gelê tirk çî bike, ji ber ku zarokên wan ji bo çî têne kuştin ew jî nîzanim?**

□ Eger ev pirsgrêk a kurdan be, esas a tirkan e jî. Heta ku çareseriyek ji pirsgrêka kurd re neyê dîtin ne mimkûn e ku rewşenbîrên tirk jî, demokrasîya xwe bibînin û bigihêjin mafên xwe yên demokratîk. Bêguman wezîfe dikeve ser milên wan jî, yanî divê ew ji bo çareseriyê siyasî ji pêvajoyê re bibin alîkar.

**Jinosîda ermeniyân, tevkujiya asûrî û suryaniyan, tevkujiyên li Dêrsim, Geliyê Zilan, Koçgiri û bi dehan ên mîna wan hene. Yanî hûn dibêjin ev tev wê derkevin holê?**

□ Erê ew tev wê têkevin raste, ji xwe dewleta tirk ji vekirina wan defteran ditirse. Ji van hemûyan ez tenê mînakêkê bidim. Bi navê "Di 1900'î de Kurdoloji" pirtûkek e min a dokûmenter heye. Tenê di serhildana kurdan a sala 1925'an de, hejmara kurdên ku dewletê kuştine ji 10 hezarî zêdetir e. Niha mesele bi gotina "Apo qatîlê 30 hezar mirovî ye" nîzanim çî ye, çareser nabe. Tenê di vê serhildanê de, ji deh hezarî bêhtir mirov hatine qetilkirin, nîzanim ewqas gund hatine şewitandin. Wê ji wir dest pê bike û heta niha, hejmareke bêpîvan wê derkeve meydana. Ji ber ku dewlet naxwaze bi tawanbarîkirinê re rû bi rû bimîne û rûyê wê eşkere bibe dikeve hewldanê û xwe xwaro maro dike.

HEVPEYVÎN: Î CAN DILBİRÎN

# Berxikên beravêtî

**D**est li ber rû, di nav destên ku tu caran kulîlk ji destê dilketiyekekê negirtî de serî; li ser laş komikek hestî, hema bêjin ket, xindirî, bi êletî sekinî. Derûnî; xeydî, xeydeke ku bi qasî li benda mîzgîna qasîdekî lal rawestiya be bihêvî. Ji danan; esrê teng saetek, du saet şûn de wê werin berbûyên êvarê û wê bixwazin. Tav; çirake ku donê wê hêdî hêdî diqede, qels veketî. Ji bayan; bêrîn, şirogermî, kûbar, sivik bi qasî temberiyên mirovên jixwehez xera nake biferaset. Werz; bihareke derengmayî, serî li çivikên koçber gerandî.

Şivanek ango Seydixan; qula bilûrên herî teng, kêsekên kuçên herî jor, li ser tilmikên rîya xana gund, li ser qelafîskan rûniştî. Bi qasî nobedarên li ber mizgefta Zerdest, têr zanîna be jî, bi qasî bawermendên ku yeqîniya xwe bi Bûda tinin dilovan û bi qasî hewariyên Îsa xebatkar, dilsoz.

Berbûyên êvarê niha li devê deriyê şevê ne. Ji xirmexirma çêrîna pêz û pêjna çîçirkên ku ji bo şîvxwarinê jî, navber nedabûn starên xwe yên hey ji dîgotinan pêk dihatin pê ve, tu sewt nedihat bihîstin. Ezman esmer, dilketiyeke dilşikestî ku bîr bibira serê xwe rakira bêguman dê tavilê dil bike-tayê.

Seydixan ligel pez herikiye, ji rê û gund hinekî dûr ketiye. Lê dengê çîçîra çîçîrka Bîra Hêlê dîsa jî dihat bihîstin. Ka bê bîra pîr dîsa kîjan tî, bi ava şolî û bikurmik têr dikir. Ka bê dîsa kîjan sax, nesax dixist û li devê deriyê şexan ji bo xweşiyê li nivîştan digeland.

Ji acizî Seydixan, bi tiliyên xwe yên ji zû de ney-nûkên wan nejkîrî, erdê ku hê rewa tê de hebû vedida, mîna mirîşka ku ji çêçikên xwe re li kurmik û kêzikan bigere. Ji nişka ve bi şewq û dengê trembêla di rê de derbas dibû, serê xwe ji nav aciziya xwe rakir, tibabekî baş lê fericî. Trembêla farên xwe tûj vêxistibûn, xwe rast li gund girtibû û diçû. Li nêzikî gund, kûçikên beredayî li vî alî, li wî alî bi trimbêlê ve repelikîn, ta ku ji kastîne ketin. Di vê keft û lefta trembêlê û hewtîna segan de, kevokên li ser xirba mala Temo lûsiyabûn tirsîyan, bi reperep baskên xwe li hev xistin û teriqîn di tariyê de, ber bi jor ve xwe li stêrkan girtin çûn, çûn... Gund ji kevokan mehrûm ma.

Guhên Seydixan bel bûbûn, wekî kîvroşka ku tenê bi şev derkeve çêrê û dengê bihîstibe. Bi nêrîna têrguman her tişt dişopand. Piştî kurtedemekê trimbêla çavîyên xwe tefandibû dîsa vexist, di cih de fitlandineke teng da xwe, zivirî û kete rîya xwe ya berê. Ronikaya çavîyan weke qireyderê ku rîya ji berfê xitimibe bi-

qelêşe, tarî diqelaşt. Trimbêlê bihîstinên ku dixwest bi dest bixe, xuya bû ku ji zîlamê misîn di dest de û derketibû destava eşa bihîstibû ku welê zû ji gund qetiyabû. Rêwingiya trimbêlê ya di rê de dirêj neajotibû, xwe li nav zeviyan qelibandibû niha, hildibû û dadibû weke navgîmên biniçîlk ên reş ên ku bi wan petrol dihate derxistin û xwe rast li Seydixan girtibû. Seydixan, cît sekinî, zîq nihêrî dîmen xitim dikir. Qedera cixare kişandinekê, trimbêlê gihîştibû nik wî. Kerî dev ji çêra êvarê berdabû. Çavên pez bûbûn fanosên ku di tariyê de dibiriqîn. Li derdora Seydixan kom bûbûn

Çola Xwedê; Seydixan, kerî, tarî, heyveke ji ruhê xwe aciz, çend stêrkên ku li ezman neditebitîn, erdekî emeliyatkirî ji nînbûna baranê û axir trimbêleke hejmarra siwariyên wê ne diyar pê ve rista tu tiştên din tune bû li vê deverê. Her şev şî-

şolî têkûz tenegehîştibû. Ev zîlam kî bûn, çi bûn, ji ku hatibûn, ji bo çi hatibûn, wan çi dixwest? Birek pîrs di serî de pêde bûbûn, serê wî diêşandin. Nêrî li revê xera kir ji ber ku tirs merga rovî bûn, dûv re fikra xwe guherî û di ber xwe de got: "Erê, tirs mîrga rovî bû, tavilê ramana xwe guhart, di ber xwe de got: "Erê tirs mîrga rovî ye û di mîraniyê de ez kekê Xezalê me." Êdî bi qasî dîrbûna lêvan nêzikî hev bûn, ketibûn devên hev lewre jî Seydixan ew nas kirin.

"Kuro lawo! cahşên gundê Aqziyaretê, ma em û ji ber we bi ku de bar bikin" got biqehr.

"Ma qey careke din hûn in"

"Her em bûn û dê her em bin, ma qey tu qebûl nakî lawo Xalito?"

"Min her qebûl nekir û ez her jî qebûl nakim. Hela çi ji qûna we tê texsîr nekin, kûçîkbavno! Ez bi tenê û destvala me

xwe tamam kiribû û berî dan kerî, ew keriyê ku egera hatina wan a ewilîn bû. Bi şîşên dest xwe kîjan mih kete ber wan, wan şîş di zîkê wê re kir, qul kir. Ew pezên hemû avis ên li ber zayîne; ne yek, ne dudu, ne sisê tev dan ber şîşan, miyek li vir perpitî, ket, yek li wir perpitî, ket. Pezê ku bi salan hatibû xwedîkirin, gihîştibû vê astê di niv saetê de telef bû. Bi wan bi derbekê qul dikir û ew dihiştin û dikuştin wekî ku firek ava cemidî vexwin. Bêyî bêhnvedan gurên zîlamên gurên boz wê şevê çol di xwîna keriyekî hemû avis de hişt. Yek bi tenê jî sax berneda, na hinek sax man, ew jî berxikên bi zayîna sezeryan bûn ku ji zikên çiriyayî yên mihan beliqîbûn derve.

Di vê navberê de her wiha bavê ku tim digot: "Bîla xisara pez tê de tunebe û çi dibe bila bibe" ji ber ku cihê rûdan lê qewimî, ne dîrî gund bû bi qereperê ji xew hişyar bû, pengizî ji nav livînan. Jê re eyan bûbû ku belayek hatiye serê Seydixan û kêrî. Bêyî fikirîna çavan, bi bayê bezê rabû, pêxas û nîvtazî xwe li bîstîne bi çargavan baz da û bi derbekê re gihîşt cihê rûdanê.

Trimbêlê çûbû û li şûna xwe tiştêkî bi lebat nehiştibû. Bavê nihêrî ku çi bibîne; tevizî, cemidî, derizî, girî jî ji bîr kir, li hemberî dîmena ku ji xezebê pêk hatî, çil xençer lêketana dilopek xwîn jî dê jê nehata. Kire haho, hewar lê çi fêde, ji zû de haho û hewar bûbûn baneşanên ji rêzê li van qadan. Xwe bi ser lawê xwe de avêt, serê wî yê ku li ser laşê wî nedisekinî dewisand singa xwe, kil kir seba ku ruh pê ve be, nebû... nedibû... Li xwe xist,

kincên ser xwe parçe parî kirin, bi kulman ax bi serê xwe de dakir. Demeke dirêj domand, tu encam jê nestand. Ku çav li pez ket, şûna lawê xwe yê ku dikîşand ji bîr kir. Ji cihê ku lê pîkolî kiribû rabû çongşikestî û çû nav beratên pezên li ber dilê wî, bi qasî lawê wî delal. Ewil çû ser miha qemer venişt, destê xwe li mihê gerand, mist da. Destê wî şil bû ji xwîna germ, di nav tiliyên xwe de bir û anî, bêhn kir. Xwînê germ û tîr bû, di rûyê xwe de, bû wekî şervanê ku berî şer rûyê xwe boyax dikir. Dîsa destê xwe bir zîkê mihê îcar serê berxikê miyê li destê wî ket, ji kerba ket. Ji ser a qemer rabû çû ser a kew, çû ser a boz, a reş, a sezer, hat ser Seydixan...

Wê şevê bav, heta ku şeveqê lê xist ji ser vê beratê baz da ser a din...

Heyvê li jor ji fediya bi herdu destên xwe rûyê xwe nuxumandibû, li jêr erd ji şerma ketibû bin erdê û stêrkên wê şevê sewsî bûn, hîna jî dîn in.



hûn dibêjin qey wê ji me bitirse."

Destê xwe li misasa xwe ya bi çek nedihesiband, şidand û dûv re çend fortên mîraniyê avêtin.

"Ez bavê Bişar im! Seyroyê mîrê şevên reş im, we hîn derbên mîran neditine!"

Cahş tev de bûn wekî şahmaran tu tif wê ke, gavên xwe leztir kirin ber bi Seydixan ve. Her bawer kirin ku xwe bigihîninê û mejiyê wî belawela bikin, goştê canê wî heb bi heb, bi mûçîngê rakin.

Çawa gihîştin hev, Seydixan, li serê yê ewil misasa xwe fena camcamkê hil kir û danî, ne serî, ne çav da ber hev, çiyê kîjanî diketê ber wî efû nedikir, ta ku yek ji ceşhan bi paş wî ve şîşek li beligoşka wî ve danî. Her der berê reş bû, li ber çavên Seydixan reştir bûn, bû qetran. Seydixan ket û hew rabû. Li erdê derbeke din lê ket û derbeke din û ji yeke din, yeke din û yeke din û hew hewce kir ku yeke din lê bikeve.

Ji ser Seydixan vekîşîyan, wan karê

vanê Mala Ebaso li van deran pezê xwe diçêrand, Xwedê dizane bê li ku mirina zîkê xwe dikir niha. Ji qere-pera lawir, mekîna û mirovên kokteyleke ji pejan pêk hatibû. Mîna tembûrvanekî xeşim ê nû fêrî tembûrê dibû her der bûbû deryaya gelawêjê.

Seydixan, bi dengekî ku her celeb hestên mirovan dihewandin "Hûn çi teva ne" got. Û deng giş qût bû ji nişkê ve û bêdengiya beriya bahozê dest pê dikir. Di navberê de bîst û pênc-sî gav hebû yan tunebû. Siwariyên trimbêlê peya bûbûn, ji hêlîna xwe ya hesinî. Bi dilekî hesinî gav diavêtin ber bi Seydixan ve. Peyv di devên wan de zêrê sor bû. Diyar bû ku her tişt ji mêj ve hatibû pêşnûmakirin ku pêdivî bi peyvê nedîtin. Serê lûleyên çekên wan di ser milên wan re tûj xuya dibûn, dîtetîsîn di ronahiya heyveronê de û di dest wan de, ji vir û nîzanim hetanî ku dirêj, şîş hebûn, ji her rewşa wan xuya dibû ew ne mîrên çê bûn.

Seydixan, ji kevala pêş çavên xwe ya

- Programa Navenda Çanda Mezopotamîyavê ya şaxa Stenbolê
- 23.01.99, şemî: Panela "Înstitûva Kurdî ya Stenbolê "Mahabad û Qazî Muhemed" Feqî Huseynî Sağnuç-Sani Tan Rêveber: Mîlîzîmî Özcan, saet:16.00. Çih: Navenda Çanda Ekin NÇM'ya İzmirê
  - 23.01.99 şemî: Konsera Koma Çiva "Dîlana Bêsînor, saet:17.00
  - 24.01.99, şemî: Konsera Koma Çiva saet:17.00
  - 29.01.99 În: Konterans: "Medya û ehtlaq" Vanîk Özmenek, saet 18.00



- Navenda Çanda Tohum
- 23.01.99 şemî: Bîranîn: Koma Agirê Jîyan, Güneşe Türkü, Danişana Diayê, Helbest, saet:17.00
  - 24.01.99 veqşem: Filmê Pirsîyarkirin (Sorgulama), saet:15.00
  - 26.01.99 Sêşem:Filmê Xewn "Düşler", saet:19.00
  - 28.01.99 pêncşem: Fîlê "Ji bo bavê min", saet:19.00
- Navenda Çanda Ileri Gözetleme
- 23.01.99 şemî: "Çekên Dayik Cararê",nivîskar: Bertolt Brecht, saet:19.30
  - 27.01.99 çarşem: Semînera Cengiz Gündoğdu "Felsefeya ehlekê, 18.00

**Yekîtiya Mamosteyên Kurd belavokek weşand:**

**Di her warî de**

**zimanê zikmakî bi kar bîne!**

Mamosteyên kurd ên ku li Ewropayê dijîn, di bin navê Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK) de, ji bo jêvegerîna zimanê zikmakî, derheqê xebatên di warî de belavokek weşand. Di belavokê de ji bo destpêkirina kampanyeyekê di warê zimanê zikmakî de daxwaz û pêşniyaz û plan hatin rêzkirin.

YMK, di seriyê daxuyaniya xwe de wiha dibêje: "Em mamosteyên Kurd ên li Ewropayê dijîn, dixwazin ku zarokên kurdan bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibin. Pêwîst e gelê me ji diyalog, xwendin, nivîsandin, ango di her warê jîyanê de zimanê xwe yê zikmakî bi kar bîne."

YMK di berdeewama daxuyaniya xwe de ji bo girîngiya zimanê zikmakî balê dikişîne ser gotina filozofê mezin Konfûçyus ku dibêje "Dema ziman bi kêmasî be, bêje nikarin ramanê baş bînin zimên. Dema erk bi qewlê xwe çênebin, ayîn û çand xirab dibin. Dema ayîn û çand xirab bibin, dadmendî ji rê derdikeve. Bi vê yekê ji gel dikeve nav matmayînê û nizane çî bike û wê li ku derê asê bibo."

Di daxuyaniyê de wiha tê berdeewamkirin: \*Ziman tîrêja raman e, her wiha mercek ji yê hebûna gelan e. Sedema çewsandin, qedexe, înkarkirîna zimanê me ji aliyê dagirkeran ve, bi taybetî girîngiya wî ye. Mêfîngeran di kesayetiya zimanê kurdî de windakirîna çand, kevneşopî, pîr-rengî, ayîn, tégîhandina me ya dadmendî û rewîştên me ji xwe re kirine amane.

\*Hemû perwerdehiyên cihanî di wê baweriyê de ne ku kesên zimanê xwe yê zikmakî nizanin, nikarin zimanên din ji baş hîn bibin. Zimanê zikmakî amanceke wisa ye ku di navbera mirovan de pêwendî, nêzîkbûn, ahengî û razberbûn çêdibe.

\*Eger zimanê zikmakî neyê geş kirin, îfadekirîna nîrxên neteweyî yên ku bi berdêlên giranbûna hatine afirandin, wê bêmecal bimînin. Der barê jiyandina zimanê kurdî de Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Heçî Qadirê Koyî, Mîr Celadet Bedîrxan, Mamoste Hemîn Mukriyanî, Hêjar, Seydayê Cigerxwîn û Osman Sebrî rolên girîng leystine.

**Bi kurdî bifikire, bi kurdî bixwîne, bi kurdî binivîse!**

YMK'ê daxwaz û pêşniyarên xwe bi 8 xalan de rêz kirine. Di pêşgotina van xalan de

daxwaza ji gelê kurd ê li Ewropayê dijî, wiha tê zimên. "Îro di nav gelên ku ji bêmecalî li Ewropayê dijî de hejmara kurdan zêde û bi hêz e. Ji bo ku çand û zimanê kurdî di qada navneteweyî de li ber çavan were girtin divê em ji bo mafên xwe yên perwerdehiyê têbikoşin. Xwestina mafê perwerdehiya zimanê kurdî ji bo hemû kurdan mafekî bîngehîn e. Ji bo bidestxistina vî mafî û serkeftina me di vî warî de, divê em li gorî van xalên li jêr hewl bidin xwe û van gavan biavêjin.

1-Divê malbatên kurd ji bo afirandina derfetên perwerdehiya bi zimanê kurdî têbikoşin û zarokên xwe bişînin dibistanên zimanê kurdî.

2-Cihên ku malbatên kurd lê dijîn, divê di bin banê Yekîtiya Malbatan (YEK-MAL) de xwe birêxistin bikin û berjewendiyên zarokên kurdan ên perwerdehiyê di warê fermî de binînin. Herwiha YEK-MAL'ên ku hatine saz kirin bi hêz bikin û bidine xebitandin.

3-Divê YEK-MAL bi lez, ji bo dersên kurdî dest bi nivîsandina zarokên ku temenê wan di navbera 0-18'an de ne bikin û daxwaznameyên xwe ji cihên herpirsî (Şehulamî, Kulturamî, û hwd.) re bişînin.

4-Malbat û YEK-MAL divê pêwendiyên xwe bi Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK) re devnî, derbarê perwerdehiyê de danûstandina agahdarîyan bikin.

5-Divê em di nav gel de, her wiha di nav hemû sazîyan de bi zimanê kurdî biaxivin, bixwînin, binivîsin.

6-Divê mamosteyên kurd di bin banê YMK'ê de bicivin, hêz û alîkariyê bidin hev.

7-Mamosteyên kurd pêwîst e ku li ser pêdiviya şarezahiya xwe, li erkên xwe yên bîngehîn û neteweyî xwedî derkevin û vî karî bidinê sermilên xwe.


8-Ji bo ku di dibistanan de perwerdehiya bi zimanê kurdî pêk were û mafên hatine bidestxistin, werine berfîrehkirin, divê ev bajarên Almanya yên mîna Hamburg, Bremen, Hannover, Bielefeld, Bortorp, Leer, Oldenburg, Osterholz/Seharmbeck, Hildesheim, Celle, Bergisch-Gladbach û hwd. her wiha bajarên Siwisê yên li wan dersên zimanê kurdî tên dayîn, divê wek mînak werine girtin û ev xebat li seranserê Ewropayê tekeve rojeva jîyanê.

Ji bo perwerdehiya zimanê zikmakî dest bidin hev! Bi kurdî biaxive, bi kurdî bixwîne, bi kurdî binivîse! Ziman maf e, li mafê xwe xwedî derkeve

**YEKÎTIYA MAMOSTEYÊN KURD (YMK)**

**TÎŞK**

**Yadî komar**



**BEKIR ŞIWANÎ**

Zor çaran rûdaw û pêşatî girîng le-mêjûy gelan da debê be xalî werçerxan û merki xov le qonaxekani dahatûy ew milete dexat. Em boçûne gelî kurdîş deqrêtewe, eweta ke awir le nîw sede le mewber dedevnewe û çaw le mêjûy pîr le karesatî kurdan dekeyn, tîşkêkî zêrin debînin ke ewîş drewşanewey estêrey Komarî Kurdistan e le şewezengî tarîk û nutekî ew serdeme pîr le gorankarî û helçûne da. Komarî Kurdistan, diway Memleketî Şêxey Melmûdî nemir, duwem ezmûnî fermanrewayî kurd e le niwey yekemî sedev bîstem da.

Le mawey şerî duwemî cîhani da, Rûsekan bakurî Îran û Îngîlezekan başurî ew welateyan dagîr kird. Deselatî rijêmî Îranîş le nawendî welat lawaz bû. Emeş way kird le hendê le melbendekani Kurdistan rewşekî taybet bête arawe. Şan be şanî em gorankariye xêra û yek le diway yekane, Komeley Jiyandinewey Kurdistan (J.K) ke diwator bû be Hizbî Demokratî Kurdistan, le hewlî berdeewam da bû bo rahênan û barhênanî roleanî gel le ser bîrî netewayetî û xebatî rêkxraweyî.

Herweha em kate gelî kurd le jêr karigerî rastewxoy bizutnewekani Şêx Mehmûdî nemir û Şêx Seyidî Pîran û raperînekani Barzan da bû. Eme serbarî biranewey şerî cîhani û azadbûnî çendî gelî cîhan le kot û bendî dagîrkeran. Hemû em hokarane û çendî hokarî tir, palî na be Qazî Mihimedewe ke rojê 22/1/1946, damezrandinî Komarî Kurdistan rabigevenê û heman roj alay Pîrozî Kurdistan berz bikatewe.

Komarî Kurdistan ke le hendê şjwên be hele be Komarî Mehabad naw debrê, zadey bîrî azadixwazaney kurd bû lew serdeme da. Ala helgiranî bîrî neteweyî û azadixwazan amanciyan ewe bû le derwazey Komarewey Kurd bihêninewe ser şanoy mêjû û bigevenin be karwanî mirovayetî. Ewan lew bawere da bûn ke serkewtinî berey hawpeymanan be ser berey faşîst da, şîney azadî legal xoy da bo gelan dênê û kurdîş helî bo dête pêş kot û nîrî dilî bişkênê û bigat be karwanî gelan. Belê, ewan neyandezanî ke gewre hêzekan, gelan deken be qoçî qurbanî bo berjewendî xoyan.

Wek lay hemuwan aşkira ve komarî taze damezrawî Kurdistan piştî be Komarî Sovêti peşû qayim bû ke dakokî lê bikat û le metirsî rijêmî Şahînaşahî Îran bipolarêzê. Belam Sovêti, Komarî Kurdistan û Komarî Demokratî Azerbaycanîş beramber be çend milyon bermil newtêk be Îran firoşt.

Barudoxî nêwneteweyî ew dem, ezmûnêkî tirî kurdanî le bar bird û derfêr nedra em gele bextî xoy taqî bikatewe û be azadî û serbexoyî aşna bê. Komarî Kurdistan, serbarî kemî temen û hemû tegerekanî di, nimûneyekî pîrşingdarî wîstî azadixwazaney gelî kurd e, ew wîstey ke ta em kateş boy tedeqoşê û xwênî derêjê.

Diway têperbûnî 53 sal beser damezrandinî Komarî Kurdistan da, katî ewe hatiwe şarezayan û pisporanî kurd, bikewne kar û hemû layene nadiyar û penhanekani em ezmûne geşey mêjûman rûnak bikenewe bo ewey newekani êsta û dahatû biken be tiwêşûy rêy azadî û serbexoyî. Her le yadî damezrandinî komar û berz kirdinewey ala da, hezaran silaw û dirûd le giyanî pakî Pêşewa Qazî Mihemed û hemû ewaney be bîrî tîj û xwênî geşîyan, gelî kurdiyan serberz ragirt û fêrî têkoşan û fidakariyan kird.

# Zimanê me kurdî ye

Zimanê me şêrîn e  
Wêjeyî û zengîn e

Tîp û kîte û hevok  
Tiştonek û metelok

Bo lênûsk û pirtûkan  
Pênûs bidin zarokan

Peyv û gotar û wêje  
Qise mamik û bêje

Jin û mêr, mezin û biçûk  
Qîz û xort û keç û bûk

Nîqaş, gotin, serborî  
Gutego û raborî

Binivîsin bixwînin  
Pêserojê bibînin

Stran, helbest û destan  
Hemû nirxen Kurdistan

Nêrîn û hest û raman  
Tu car nabin û bêziman

Hîn bibin van hemûyan  
Behev kin ji çar aliyên


Ziman her tiştê me ye  
Bingeha nîrxên me ye

Gava ku hûn dicivin  
Bu kurdî biaxivin

Ger dixwazin hûn hebin  
Azad û serbixwe bin

Li ziman bibin xwedî  
Pir bixwînin bi kurdî

ADAR JIYAN



Welat, ziman û dîrok  
Çand û huner û çîrok

## METELOK

### Hopanî

Hopanî hopanî  
Keziya min panî  
Avêtin golanî  
Gola min qamîş e  
Kekê min çawîş e  
Çawîşê biçûk e  
Jê ra anîn bûk e  
Qîza Hesên Begê  
Sêva ser kulekê  
Wê sêvê hiltîne  
Wê gulê datîne  
Gul gula hedada  
Qewl û min bi te rada  
Çûme qulkek tarî  
Teyrek tê dinalî  
Min got teyro çiyê?  
Got baskê min şkestî ye

### Leglegê

Çaqil begê  
Mîr Mistefa  
Zingil û defa  
Def li ku ye  
Li hafa çiya  
Çi dixwe  
Gul û giya  
Bi çî avê vedixwe  
Bi dilopên xaniya.

### Hêkê Hêkê

Hêkê hêkê  
Hêkanekê  
Dabizdanê  
Qulûzanê  
Xulxule ye  
Genim û ce ye  
Bîst li te ye  
Bar li te ye

BERHEVKAR: GERNAS AVAŞÎN

## VAN PIRSAN BIBERSIVÎNIN...

■ Hevalên hêja, ji bo ku hûn bibin zindanê, diya we 175 hêk da we. We hêk xistin selîkê û hûn meşiyên, di rê de binê selîka we çetîya, dema hûn gihîştin zindanê 19 hêk hêkê we mabû. Gelo di rê de çend hêken we ketine.....?

✓ Komara Mahabadê di kîjan salê de ava bû? Gelo ji ber çî rûxiya?



### Merheba

Navê min Nûjiyan e.  
Ez evîndara kesk û  
sor û zer im.  
Ev wênayê min bila ji  
we re diyarî be.

### Jiyan û aşî

Li çiyayê Kurdistanê  
Em zarok kulîlk in  
Kulîlkên kesk, sor û zer  
Di aştiyê de em baz didin  
Baz didin ku aşî were  
Baz didin ku azadî were  
Baz didin ku biratî were  
Baz didin ku jiyan were

Rozerîn Salik

### Azadî

Ez kesk û sor û zer im  
Ez welatê xwe dixwazim.  
Ez kesk û sor û zer im  
Ez Kurdistanê dixwazim.  
Ez kesk im  
Ez sor im  
Ez zer im  
Ez aşî û azadî dixwazim  
Ka Kurdistan  
Ka welat  
Ka Apo û welat  
Ez dixwazim welat  
Ez kesk im, sor im, zer im  
Ez Kurdistanê dixwazim  
Ez gulên Mezrobotan im  
Aşî û serfirazî dixwazim

Ayşe Güleç-Selda Botan

# Yekemîn hejmara 1999'an a Jiyana Rewşen derket

Hejmara 26'an a kovara Jiyana Rewşen derket. Di hejmara Rewşenê ya meha rêbendanê de gelek mijarên têvel cih digirin. Di vê hejmarê de jî digel helbest, werger û lêkolinan; çîrok, nivîsên analîzî, hevpeyvîn, gotar, pêkenokên ku ji zimanê îngilîzî hatine wergerandin û hwd. cih digirin.

Feqî Huseyn Sağınç wekî hejmarên din di vê hejmarê de jî lêkolînên xwe yê portreyî didomîne. Huseyn îcar jî jînenîgarîya helbestvanê kurd Siyahpûş dikole û bi me dide nasîn.

Medenî Ferho bi nivîsa xwe ya analîzî ya bi sernavê "Çend Gotinên Giştî" wêjeya kurdî ya devkî û nivîskî dide ber hev. Li gorî Ferho ji ber qedexebûna nîrxên kurdewarî wêjeya kurdî di nav folklorê kurdî û medreseyên kurdan de derfetên jiyane dîtîye. Vê jî bi giranî wekî helbest xwe daye der. Ferho diyar dike ku çanda kurdî xwe bi piranî bi saya folklorê kurdî û medreseyên kurdan li ser piyan hiştîye. Lê her çiqas ev her du tiştên girîng bingeha çanda kurdî bin jî têrê nakin. Lewre çanda kurdî di destanên kevn ên kurdan de yê ku di kûrahiya dîrokê de şax û zîl vedane, veşartî ye.

Li aliyê din di kovarê de gotareke Helîm Yûsiv cih digire. Yûsiv di gotarê

de li ser tîkiliya rewşenbîrên kurd û tevgerên siyasî yê kurd hûr dibe û wiha dibêje: "Nivîskarê kurd him nivîskar e, him weşanxane ye, him belavkar e, him parsek e."

Di vê hejmara kovarê de hevpeyvîna ku digel Beşîr Botanî hatiye kirin renegekî cuda dide kovarê. Di hevpeyvîna ku Gabar Çiyan kiriye de Botanî li heyrano kurdî radiweste. Botanî heyrano kurdî wiha dide nasîn: Peyva heyrano jî peyva heyrano peyda bûye. Naverok bi xwe gilî û gazinên evîne ye.

Wekî tê zanîn ev cara yekemîn e ku heyrano kurdî ji layê Beşîr Botanî ve hatine berhevkirin. Ev berhevoka ku ji 120 rûpelî pêk tê, ji aliyê Weşanxaneyê APEC'ê ve hate çapkirin.

Her wiha Ehmed Huseyn di lêkolîna xwe ya bi sernavê, "Rastiyên Zerdeş-



de li ser dîroka Zerdeştîyê, kurtejiyana Zerdeşt Pêxember û taybetiyên felsefeya Zerdeştîyê radiwest û aliyên hevpar ên tevgera neteweyî ya nûjen Zerdeş-

tiyê"

tiyê li ber çavan radixe.

Di vê hejmarê de ligel gelek nivîsên din, pîrbûna helbestan balê dikişîne. Nivîs û helbestên navborî ev in: "Her Ev Kolan û Talan E Dîaspora", Kawa Nemir, "Şeva Herî Dirêj" (çîrok), Nihat Çelik, "Rexne û Teoriyên Wêjeyê" (werger),

"Dijle Sor Diherike" Roşan Lezgîn, "Mamoste" Çiya Mazî, "Amed" Selamet Menteş, "Destana Nameyên Ji Êgir" Harbi Soylu, û "Pêdiviya Tazî" jî İlhamî Özer.

Ev hejmar kovarê li gorî yê din bi naveroka xwe rengîn û têrtijî dixuye. Lê nemaze di warê rêpîvanên rastnivîsa kurdî de kêmasiyên berbiçav xwe dane der. Bo nimûne, di kovarê de bi balkêşî li ser nivîsên ku bi devokên herêmî hatine nivîsandin, nayê rawestandin. Di vî warî de bi taybetî jî mirov dikare nivîsên Feqî Huseyn û Medenî Ferho wekî mînak bide. Bo nimûne di nivîsa Ferho de li şûna qalibê 'li hemberî' 'li hemberê', 'ji nişka ve' 'ji nişkê ve' çend mînak in. Dîsa ji bo herikbarîkirin û zelalkirina nivîsan hewldaneke hêjayî dabaşê tune. Lewre jî dema ku mirov hin nivîsan dixwîne digel ku kurdî baş dizane jî, bivê nevē ditengije.

MEMED SERHEDÎ

## Hilbijartin

OSAMN ÖZÇELİK



Ger tu guhartinên nû çênebin, wê di 18'ê meha avrêlê de hilbijartinên tevahî li dar bikevin. Hilbijartinên herêmî û yê parlemantoyê.

Li Tirkiyeyê kê-m-zêde 62 milyon mirov dijîn. Ji wan 35 milyon û sed hezar kes hilbijêr in. Ji ber ku êdî mafê ciwanên ku 18 saliya xwe qedandine heye ku dengê xwe bidin, zêdetirî jî sedî pênciyê nifûsê hilbijêr in. 35 milyon hilbijêr wê li 80 bajar, 921 navçe û 2270 bajarokî (belde) dengê xwe bidin.

Ji 62 milyon mirovî çend milyon kurd in kes nizane. Her kes li gorî daxwaza xwe hejmarekê davêje holê. Turgut Özal gatibû 12 milyon kurd hene. Ev hejmar jî texmîn e. Heta îro ne eşkere û ne jî bi dizî kurd nehatine hejmartin. Kurd nayên nasîn ku bîr hejmartin. Li gorî texmîna

Özal em dikarin bibêjin ku îro kurd 15 milyon in. Yê ku dibêjin 30 milyon in û yê ku dibêjin 20 milyon in jî hene. Bi bawerîya min bi kurdên asîmîlebûyî ve em ji 30 milyonî zehftir in. De ka em bêjin 20 milyon. Ji bîst milyonî 11 milyon kes hilbijêr in. Ne hemû, nivê hilbijêrên kurd dengê xwe bikin yek, emê rêveberîya Tirkiyeyê bi dest bixin.

Mixabin kurdan dest ji berjewendiyên xwe yê mezin bedaye û destavêtiye berjewendiyên piçûk û bi vî awayî roviyan zora şêran biriye. Me her hindekan daye ser riyeke nebixêr. Mele û sofikên me yê bêhiş bi dûvika Refahê girtiye. Bi salan Erbakanê nijadperest ê sextekarê olî em xapandin û îro ala xapandinê daye destê qumqutê serokê Fazîletê Recai Kutun. Kutun ji bo ku xwe li ber dilê generalan xweş bike dibêje: "Jehrkuja HADEP'ê Fazîlet e." Hê jî kurd bi ser hişên xwe ve nayên.

Elewiyên me yê ku bi nexweşîya "laîsîzma dewletê" ketine jî destên wan ji CHP'ya nijadperest nabe. Tevkujiyên ku "laîk"an kirine tu kesî nekiriye. Nexweşîyeke psîkolojîk e. Mirov xwe dîke şûna qesasê xwe û bi wî re dibe

yek.

Kurdên ku hatine bêşexsiyet kirin jî di nav partiyên mîna DYP, ANAP û hwd. de beyhûde dixebitin. Dilnexwazên kurdan hûr û kûr difikirin, planan çêdikin û dafikan saz dikin ku kurdan ji ber hev din bixin.

Di hilbijartinên sala 95'an de me milyonek û 200 hezar deng girtin. Di vê hilbijartinê de ji bo ku baraja %10 bê derbaskirin divê em du milyon û 700 hezar dengî bigirin. Hêza me ya veşartî têra vê dike û zêde ye jî. Belê xebat divê.

Xebat bi nameyekê dibe, bi telefonê dibe û bi faksekê jî dibe. Mirov qet nikaribe xebatê bike jî, dikare alîkariya aborî bike. Îro politîka buha bûye. Ne pêwîst e ku mirov qala hêza aborî bike.

Banga me ya din jî ji rewşenbîr, xwende, zana û komikên kurd ên ku xwe ji HADEP'ê dûr xistine re ye. Em amade ne ku we hembêz bikin. Lê hûn.. Hûn ji xwe amade bikin û werin em milê xwe bidin hev û din vê qedera xwe ya reş ronî bikin.

# Xalo tu dîtî

**R**ojekê xal û xwarzî gelekî digerin. Berê xwe didin çihêkî ku çî bibînin, wa ye cerdirmeyek ji wir ve tê.

Xal dibêje: "Kuro bavo ev ji ku derket. Lê ez qaçax im nasnameya min ji li cem min nîn e."

Xwarzî dibêje: "Xalo! tu xwe di nav van hejikan de veşêre. Ez baş bi tirkî dizanim, ez dê digel cendirme bipeyivim. Xal di nava hejikan de xwe vedîşêre."

Xwarzî bi tirs û saw nêzî cendirme dibe, cendirme yekser dibêje: "Kimli-gîni çikar! (Nasnameya xwe derxe)"

Xwarzî hema di çih de dibêje: "Welle xalo bi serê û bavê te kim, cendirme tu dîtîye. Zû derkeve!"

Xal dibêje: "Helal be ji xwarzîyê min re çiqas bi tirkî dizane. Dibêje ji nav hejikan derdikeve."

BERHEVKAR: PISMÎRÎ CULEMÊRG

Derî veke ez hatim

Mirovek di rê de diçe û baran lê dibare. Mêrik gelekî şil dibe. Dema ev mêrik digihêje gundekî hema xwe bi wî halê xwe davêje malekê. Dilê xwediyê malê bi wî dişewite, radibin kincên wî

jê dikin, kincên nû didin wî. Sobeyê jê re vedixin, mêrik kincên xwe li ber zîwa dîke, xwe germ dîke. Lê mêrik piştî ku xwe zîwa dîke jî êdî çar pênc rojan li wê malê dimîne û piştêre diçe.

Piştî çend rojan îcar digel hevalekî xwe tê heman malê, dibêje: "Gelo we

ez nas kirim?" Xwediyê malê dibêje: "Çima tu kî yî ku em te nas bikin."

Mêrikê: "Pêleyek berê îro, ez gelekî şil bûbûn, ez hatim, we kincên min zîwa kirin."

Xwediyê malê dibêje: "Belê belê em te baş nas dikin."

Mêvanên me di sa çar pênc rojan di minin û diçin.

Piştî demekê mêrik di sa tê, rasteras derbasî hundir dibe. Xwediyê malê dibêje: "Tu kî yî?"

Mêrik di sa çiroka xwe vedibêje. Li ser vê yekê xwediyê malê dibêje: "Ez rojekê tu hatî, tu gelekî şil bûbûyî di me bi te şewitî û me alikariya te kir, tu bê sedem çar pênc rojan di nav çavê me de mayî. Wisa xuya ye me xerab kirîye."

Radibêje satîlek tişî av bi ser mênî de dîke û dibêje: "Wa ye me tu di sa kirî, rabe here mala xwe."

Fetwaya li ser her çar mezheban

Mirovek ba bi ber dikeve û diçe bî meleyê gund, dibêje: "Seyda îro ber nimêja xudbê min got qey ba bi ber mî ket, lê dema min şalê xwe ji xwe kir min nêrî ku ji pa re di aliye hundir di şalê min zer bûye. Gelo mele li ser mezheba malikî tu dibêji destmêja min şikest an na?" Mele dibêje: "Na na welle li ser her çar mezheban te bi xwe dîtîye."

BERHEVKAR: FATÎH BERDEWAN




## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (156) XAÇEPIRSA

1	K	E	O	S	A
G	O	K	T	E	P
R	E	L	A	W	A
Û	M	A	O	L	M
K	R	N	E	M	A
T	Û	R	H	N	A
B	A	Z	B	Û	N
F	A	M	L	E	Û
R	A	A	L	A	N
M	Û	N	A	Q	A

Komkuji	Navçeyekê Bedîse	Tipa dî r'yê	Li ser çiyê raste	Çiyayekî kurdîstane berepaşkî	Paşgîrek berepaşkî
Vîladîmîr îlyîc	Bî devokî navê	Sembola nîkelê	Xweşik		
			Becare		
			Cînavka pîrsê		
Gramer				Xwedayek	
Xwûşka mezin				Bê zîman	
	Tipa yekem	Plana Zapata			Jan
	Navekî jînan	Dengdarê n kar			
Eniya PKK'ê			Rêwînda		
Banga telefonê			Karker berepaşkî		
		Xwedê		Can	
		Sembola iyotê		Tepsi	
Bere cephe			Pê rê aswalt dîkin	Tipa dî r'yê	
Tipa duyem				Roj	
	Paşgîrek	Çiyayî dîrî			
		Tipa dî q'yê			
Xwedayê xerabiyê					
Mêweyek					
		Bazda û cû			

### Bersiva Xaçepirsa 154'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmara me ya 156'an pirtûka Mahmut Bakî 'Hêlîn'e



**Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava quiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata 154'an Pirtûka Feqîyê Teyran 'Ey avê av' qezenç kirine ev in: Çelebi Erdiñç/İskenderun, Mustafa Taner/Semsûr, Hüseyin Doğan/Zonguldak, Bilal Aslan/Edene,

PEYVA VEŞARÎ 1 2 3 4 5 6 7 8

# Hemû hetan ra raveşiyayin lazim o

Ma yê şimi kotî û kotî rastê Dimilî (kirdkî) zanayan yemi, iyê tayn ca dayinê dimilî ser rexnanê xo anê ziwan û wazenê ke rojnameyê xo Azadiya Welatî de niwisê dimilî vêşî bivînê. Bi rastî jî na wasten ca de na. Lazim o ke cewabê wastena wendoxan namedo bîna dimilîzanayan bîdiyo. Çi ke rojnameyê Azadiya Welat rojnameyê lehçeyan û fekan niyo, rojnameyê neteweyî yo.

Coka jî gerek rîper û niwisanê Azadiya Welatî de wendox û dimilîzanayey rastê niwisanê dimilî nusyayan bêrê û ê jî bişê rojnameyê xo biwanê. Çi ke wexto ke dimilîzanayan rojname giroto dest û tede niwisê dimilî nêdî, fina didin ê rojnamey nêgenê, bigirê jî zerî ra nêgenê, jew qandê hetkarî genê. Wina biyayin de jî, o rojname nêseno bibo rojnameyê neteweyî. Nê jew qandê dimilî wina niyê, qandê soranî jî wina yê.

Rojnameyê Azadiya Welat o, nînan zano û qandê nê kemiyan werte ra hewadayin ci dest ra çiçiyoyeno keno. Wa nay ra gumanê kesî çinê bo. Vernî ra hetanî nika, ma yê xebityemi ke na kemiyina xo werte ra hewadim û wastena wendoxan biyami ca. Bi rastî jî goreyê verî her çiqas goreyê wasten nêbê jî kemiyinê ma biyê taynî û roj ra roj jî

Verî ma tim û tim vatê, ma yê wazem rojname de niwisê dimilî vejîyê û rojnameyê Azadiya Welat hetê her kurdê welatperweriya biwaniyo. Biyarê xo vîrî ma na wasena xo na rîper de çend finî ard ziwan. Ze ke lakî bikim ma dimilî zanayan ra wastê ke niwisê dimilî binûsê, hem lehçeya ziwanê ma dimilî vilêşiyayin û asimilebiyayin ra bixelsiyo û hem jî şêligê (kitle) ma yê ke dimilî zanê, bişê rojname de rastê niwisanê dimilî nusyayan bêrê û rîperanê rojnameyê kêfweşîna akirê û biwanê.

iyê benê kemî.

Ma yê bawer kemi şimayê jî, nê raveşiyayan vînenê. Raveşiyayinê ma, şimayê na rîper de vînenê. Wexto ke ma na rîper niwisanê dimilî nusyayan rê avîrmê o çax jew embazî tenya na rîper de nûstê û ey jî hetanî rîper qedînayê des eyniyayin ra aw ardê.

La belê nika ma yê kêfweşîna şemi vajim ke, zey verî niyo. Niwisan ra şimayê jî vînenê, panj şeş hefteyê o embazo nênuseno, feqet rîper de niwisê hem jî ciya ciyayê vejîyenê. Her niwisê jî hetê zewbî kesana nusyenê.

Verî ma tim û tim vatê, ma yê wazem rojname de niwisê dimilî vejîyê û

rojnameyê Azadiya Welat hetê her kurdê welatperweriya biwaniyo.


Biyarê xo vîrî ma na wazena xo na rîper de çend finî ard ziwan. Ze ke lakî bikim ma dimilîzanayan ra wastê ke niwisê dimilî binûsê, hem lehçeya ziwanê ma dimilî vilêşiyayin û asimilebiyayin ra bixelsiyo û hem jî şêligê (kitle) ma yê ke dimilî zanê, bişê rojname de rastê niwisanê dimilî nusyayan bêrê û rîperanê rojnameyê kêfweşîna akirê û biwanê.

Ze ke cord jî vajîya, nika zey wastena ma nêbo jî, niwisê dimilîyê nusyenê û rişyenê na rîpera rojnameyê de vejîyenê. Nusyayinê niwisanê dimilî ser ma xeylê kêfweşîm û ma yê wazemî wendoxî ni-

wa tepya jî binûsê. Tenya înan ra jû wastena ma esta. Niwisanê xo heveyê kilm binûsê, çî ke rojname de ca hend hera niyo. Hemû rîperê rojnameyê zey niwisanê kurmançî û soranî niwisanê dimilî rê zî akerdeyê. Her mijara rîper zewbiya. Coka wendoxê ma yê ke niwa tepya niwisî birêşê wa niwisê xo heveyê kilm tepşê. Çi ke niwisê yenê ma yê ewnenê zaf derg o. Mecbûr manemi kemi kilm. Wexto ke rojname kewt ci dest jî, senî ke ewnenê niwisê ci biyo kilm hema pirêskiyenê telefoniya û (heveyê jî hêrsa) rexnanê zaf tujan anê ziwan. Ancî nînan miyan de heveyê niwisî estê nêwanyenê. Wendoxî desda û werdî werdî nûstê coka jî nêwanyeno yan jî fahm nêbeno ke ey wasto çî binûso. Niwisanê winaynînan de mecûr maniyeno çiyoyeno ke to a seat de fahm kerdo binûsê. O çax rexne yeno. Ma cord jî ard ziwan rexneyê raya ma akenê, lazim wendoxî her rîpera rojnameyê ser fikir û rexnanê xo biresno rojnameyê. Ma yê nînan jew qandê pêjewin şaş fahm nêkerdin nûsemi. Çi ke cayo ke pêjewin şaş fahmkerdin bi, wija ra xeyr nêvejiyeno. Coka jî pêjewin rast fahm bikimi û karûbarê xo goreyê rastîn bikim ke wa qe teva meşo verê raveşiyayina ma bigiro.

AZADIYA WELAT

## TÎJ



LERZAN JANDÎL

## Nika se beno?

Mordimê ke dîroke ra ders nêgênê/nêcênê, mordimê ke zordariya xo ra înat kenê, mordimê ke hetanî demê peyniyê nê metodanê xo ra xêr, menfat diyo, fam nêkenê, ke çîqa karêde kefçil kerdo, demoke firsendanê rindan biremnê.

Dewleta tirk jî çiyêde niyanên a. Firsendoke kewt dest, ebi destê xo pêyser ton da, çareserkerdina problemanên kurdan ebi metodanê demokratîkî nêwaştê. Sey/zê her demî metodanê xo yê kanan de israr kerdo.

Amayena birêz A. Öcalanî sey yew firsendêke dîrokî nêdî. Duştê nayê de didanê xo musnay kurdan, însanê ma deyî lîncêrdene, guretene, kîştene. Dest bi propagandayê de bêesl û bêasetera kerdo. Xo wunciya ayneyê dêwan de dî. Mêrasê Osmanîyan ser ro vindene de înat kerdo.

Benoke ebi Roma ra şiyayinê birêz A. Öcalanî dewlete vaco, ke ebi metodanê xo ez kewta ser, lecê propaganda de kurdan kerdo vinî. Ebi naye jî xo bixapno. La belê rind êno zanayene, xoxapnayene karêde rind niyo. Mor-

dem her çira ver zarar dano xo. Benoke demê kilmî de mordim tayê berhe-man bigêro, nê jî pragmatîk, la belê demê dergî de vîndîkerdox mordimê ke xo xapneno wo.

Eke bêro vîndero, Dewleta Tirk vana: "Ma antî-împeryalistî me, xêca ma ra dostê ma çinê, tewr girs tirk û Tirkiya wa."

La belê demê Roma de reyna zelal dî, ke tewr girs Tirkiya niya, girsî wunciya çend dewletê Ewropa û Amerîka wa. Bê Amerîka, Almanya û Fransa, bê hetkariya nê dewletan rûmetê dewleta tirkî zehf biyo kêmi û no rûmetê daye jî roj bi roj beno şenik. Êndî kes sey verî ere daye bawer nêkeno. Sebêbê nayê jî xebatê kurdan o.

Ebi hetkariya Tirkiye guretene, dewletanê Ewropa serede jî Almanya û Fransa rûyê xo yo restkên musna ma. Hetanî nika vatêne: "Eke Tirkiya wazena bikuyo wertê ma, ganî derheqê heqanê mordiman de gamanê demokratîkan berzo, çareserkerdena meseleya kurdan de tayîna nerm bo û kurdî jî

duştê naye de seba metodanê demokratîkan! rakerde bê."

Ewroj ma tayîna araste vînenîme, ke mesela înterese yê, mesela pereyê, mesela hêrnayên û rote na. Metayêke kapîtalîstan viraytê, ha panzerî bê, ha firokî bê, ha jarê çemî bo, ha komputur bo, ganî bêrê rotene, ke wa pereyê bimbarekî (mubarekî) bêrê. Yanê heqê mordeman, demokrasî, çareserkerdena probleman nê, perê muhîm ê. Çiyoyeno ke nênan hetanî nikan vatî bî ya înan bi xo jî bawer nêkerdên ya nêşikiyayî ke bivînê, ke kurdî jî rojê şîkînê kulvarê dînan de ajne bikerê, ya jî hênî beredayê ke dirûtikiyenî kerdena ra nêşermayînê.

Kamcî texmîn raşt beno wa bibo, çiyê nêvurîno: Qederê kurdan bi xo dest der o. Yanê ma dest der o. Ma ganî wayîrê qederê xo bivecîme û ê ma bi xo tayîn bikerime. Eke ma neyê şikiyayîme û bînî, ne waştene ra, le belê mecûr mendene ra, hetê ma kenê.

**WELAT**  
ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

Xwedî (İmtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN

Yönetim Yeri:  
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308  
BeYOĞLU/İstanbul

TEL: (0 212)

245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13

FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê

(Genel Yayın Yönetmeni)

SAMİ TAN

■ Berpîrsê Karên Nivîsaran

(Yazı İşleri Müdürü)

M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE

Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:

Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN

BİRYAY Dağıtım

■ NİVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ

(İrtibat büroları)

■ Amed:

Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin

Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir

Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene

Tel: 0 (322) 351 42 78

■ (Nünerê Giştî yê Ewropayê)

Mahmut Gergerli

Tel: 49 871 672 29

Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:

Ihsan Kurt

Tel-fax

41 21 652 76 07

■ Fransa:

M. Ali Doğan

Tel- 33 614 32 43 55

■ Belçika

I. Can

Tel: 32 53 64 12 41

■ Hollanda:

S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Suriye:

Jana Seyda  
Helim Yûsif

# Ezmûna Mehabadê

Endamên hikûmeta Mehabadê jî ji bo ewlehiya gelê xwe dane ser rêça Qazî Mihemed. Qazî Mihemed bi tevgera xwe ya dawîn wezîfeya xwe li hemberî gelê xwe bi cih anî. Ji bo ku gelê xwe ji zilm û tevkujiyê biparêze canê xwe feda kir. Li gorî hin bîr û baweriyên wî xwe sparte neyar lê ev ne rast e û bi dîtina min biryareke di cih de da.

**D**ema Komara Mehabadê di sala 1946'an de hate avakirin, mercên hundirîn û derveyî ji bo temendirêjîya wê ne guncan bûn. Ev yek bi hinek bûyerên ku piştî avabûna wê pêk hatin, jî hate çespanandin. Mirov dikare gelek encaman ji hoyên ku bûne sedema hilweşîna Komarê derxe.

Ev rastiyeke ku ne tenê cihan her wiha kurd bi xwe jî ji bo Komarê ne amade bûn. Komar bi hebûna xwe qerzdarê mercên li derveyî vîn û kontrola kurdan bû. Van mercan di domana Şerê Duyemîn û piştî wî jî demekê kişand, lê ne zêde. Niştecihbûna hêzên Sovyetê li bakurê Îranê û handêriya wan bo avakirina Komara Azerbaycanê ku rê li ber avabûna Komarê vekir derfeteke baş e. (A rast azeriyên ku piştevanî ji Moskovayê digirt, warê kurdan wekî êrdima xwe dizanî.)

Tu caran di navbera Komara Otonom a Kurdan û Sovyetistanê de peymaneke hevkarîya berevaniyê

\*Yekîtiya Sovyetê ji bo berevaniya Komarê soz û peyman nedabûn. Berevajî wê yekê wê dewletê bi dewletên mîna DYA û Îngilistanê re ku li dijî Komarê ne û piştî ku li ser mijara neftê lihevkerin çêbû jî bi Îranê re peyman girêdan.

\*Komar ji hêla hêzên neyar; Îran, Iraq û Tirkîyeyê ve hatibû dorpêçkirin. Van dewletan gişan jî di nava xwe de birek kurd dihawandin û ji ber wê yekê jî ew komar ji xwe re wekî xetere dîtin, lewre jî wan li dijî wê hevkarî dikir. Tehranê tu caran Komar nas nekir, lê serokatiya Komarê bi soz û peymanên pûç xapand.

\*Komar li herêmeke biçûk a Kurdistana Îranê hatibû avakirin, serjimara gelê herêmê ji milyonekê kêmtir bû. Li dor Komarê xelegeke ku ji kurdên di bin destê Îranê de mabûn, pêk hatibû. Ji ber bîr û ramanên serokatiya Komarê yên aştîxwaz û jî êrîşbaziyê dûr tu caran xebata berfirehkirina herêma di bin destê Komarê de nehat kirin, da ku ketina cihê stratejîk bo hêzên

mirov jî digel hemû tecrûbeyên xwe yên servaniyê li gorî rêz û rêçikên eşîrî hatibûn birêxistinkirin.

\*Ji ber ku li herêmeke teng bi serjîmareke hindik hatibû danîn û wext gelekî teng bû, komarê nikaribû xwe di warê rêveberî, danîna saziyên civakî, aborî û çandî de baş birêxistin bike û di warê siyasî de reforman pêk bîne. Ji bo ku Komar karibe gelê herêmê wekî hemwelatî bi rê bixe û bi rê ve bibe da ku ew karibe li ser piyên xwe raweste, ev kar giş pêwîst bûn. Digel wê rewşê jî hemû kesên ku li ser Komarê li hev kirin, li hev dikin ku rêveberîya Komarê di warê meşandina reformên civakî de jîr bûye û di dema rêvebirina karên Komarê de tiştên nelirê hema mirov dikare bibêje qet nehatine kirin.

\*Serokati û hemwelatîyên Komarê li ser diwaroja komarê bi şik û guman in, lewre ew jî dibînin ku mercên guncan ên bo damezirandina Komarê demdemî ne. Wan jî dikaribû bibînin ku Sovyetistan wan tenê dihêle û qedera wan di destê hikûmeta navendî de ye. Serokatiya Komarê hê jî hêvî dikir ku ewê karibin bi guftûgoyên digel hikûmeta navendî hinek tiştan bi dest bixin, lewre jî wan qet serê xwe ji bo çareyên din nedişand. Tu hêz demexîst pêşberî artêşa Îranê da ku karibe daxwazên xwe bide pejiwandin. Îranê heta dawiyê bi pêşniyazên pûç serokatiya Komarê xapand û di dema guncan de jî êrîş bire ser. (...)

Tevî aqûbeta Komarê ya trajîk, Serokê wê Qazî Muhemed nişana yekîti, dilsozî, rûmet, dadyarî û aqilmendiyê bû. Li ser serokatiya wê herkes lihevhatî bû. Wî û rêveberên din tevî hemû tengasiyan barê xwe bi awayekî baş hilgirt.

Qazî Muhemed mirovekî rewşenbîr bû. Wekî Qazî hatibû perwerdekirin û karibû hemû kêşeyên giran çareser bikira. Ew li hemberî mekanîzmeya Tehranê zêde mirovhez, aştîxwaz bû û li hemberî dek û dolabên Sovyetê û rojavayîyan zêde dilpak bû. Kêşeyeke bingehîn jî ev bû, Qazî zêde pišta xwe




bi hevalbendiya Sovyetistan Azerbaycanê ve girêdabû. Wî piştevaniya wan a bo Komara Kurdistanê dinexand û bi çavê biçûk li gir û kîna rejîma Tehranê ya hemberî Komarê dinihêrî. Ew giraniyeke pêwîst li ser dek û dolabên li hemberî Komarê û piştevaniya meza a ku DYA û Îngilistanê dida hikûmeta navendî, nedihate rawestandî.

Qet nebe, dema roja trajîk hat, Qazî Muhemed wekî serokekî, bi dilekê berpirsiya xwe anî cih û jiyana xwe feda kir. Her wiha endamên hikûmeta wî jî bo ewlehiya hemwelatîyên xwe dane ser rêça wî. Bi kirina xwe ya dawîn berpirsiya xwe ya serokatiyê hemberî gelê kurd pêk anî. Qazî Muhamed li cihê ku canê xwe biparêze gelê xwe ji tevkujî û zilma neyar parast.

Min di gelek gotûbêjan de û di ser de jî Mustafa Barzanî, ji devê gelek serokên kurd peyva "diviya Qazî Muhamed xwe nesparta" bihistiye. Li bi dîtina min Qazî Muhamed di wê rojê teng û giran de biryareke di cih de da kir ku navê wî heta hetayê jî bir nebe ew bi serfirazî bê bibîranîn. (...)

Ev nivîs ji hejmara bi navê "Piştî 50 Sal Komara Kurdistan" a kovara "The International Journal of Kurdish Studies" hatiye wergirtin.

MAHMÛD OSMAN  
WERGER: SAMÎ BERBEYAN



nehate girêdan. Avabûna Komarê rastî dema ku hêzên Sovyetê ji bakurê Îranê vedikişin, hatiye. Du dewletên ku li başûrê Îranê hêzên xwe bi cih kiribûn; DYA û Îngilistanê li dijî avabûna Komarê bûn û wan piştevaniya xwe ji bo rejîma Tehranê diyar dikir.

Bi kurtasî mirov dikare sedem û qel-siyên ku bingeha têkçûna Komara Otonom amade kirine wiha rêz bike.

derveyî dijwar bibe. Vê yekê karê parastina Komarê diwartir kir, lewre karê parastinê bi destê artêşeke pispor û timî nedihate kirin, lê bi destê hêzên eşîrî dihate kirin. Hêzên eşîrî dilsoz bûn, lê ew ji serokatiya Komarê zêdetir girêdayî serokê eşîra xwe bûn. Divê em jî bîr nekin ku giraniya hêzên berevaniyê yên Komarê mirovên ku Barzanî digel xwe anîbûn, bûn. Ew